

**M**ixabin rêxistinên kurdî tişteki nakin û haya wan ji me û ji muzîk û hunerê tune ye, ma kîjan tirk heye ku Kevokê, Çeçanê, Xeydokê negotiye, tevî ku dizên awaz û stranên kurdî pir in jî, lê tu rêxistinên kurdî doza mafê me nekirine. Bi xurtayî û tu tiştî ji huner û toreyê re nakin. Rexneyên min jî li ser hinekan ji vanên ku stranên min dibêjin hene. Wekî Şivan, Rezazî, M. Şexo, ku stranên dibêjin, carinan helbestê xera dîkin û ya dirust nabêjin. Bila stranên min bibêjin, lê ez bi hêvî me ku xera nekin.

**Hunermend Sefîd Yekîl:**

## 'Rêxistinên kurdan li hunerê xwedî dernakevin'

- "Refah û sistema dorawan" nivîsa duyemîn a nivîskarê me A. MELİK FIRAT e. Di vê nivîsê de Fîrat bi sistema kemalî re Partiya Refahê jî dinirxîne. Rûpel 13
- JAN DOST, bi sernava "Di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de Îblîs" ramanên mutasawûfên îslamî û Xanî yên der barê Îblîs de dide ber hev. Rûpel 4
- Rojnamevan û nivîskar FAYSAL DAĞLI bi nivîsa xwe ya "Li Berlinê jiyana epîk" beşdarî nav nivîskarên me bû. Rûpel 5





NAVEROK



Mukrime Tepe:  
Jibîrkin xiyonet e



R. Dilovan: Di warê muzîkê de komeke nû, Agirê Zerdest



Riyat Ehmet Hesen:  
Mele û spor

Ji Xwendevanan

**GELEK** xwende û rewşenbîrên me kurdan dibêjin em welatparêz in, lê bi tirkî dipêyivin, zarokên wan qet bi kurdî nizanin, he-ta doza kurdî bi zimanê tirkî bi hev re mineqeşe dikin. Divê em giraniyeke zêde bidin ser xebata ziman.

Ez bala we bikîşînim ser xaleke din jî. Peyv bi devê herêmi tenê nivisandin. Mînak: Tune (çune) birçî (birsî), binihêre (binêre), bira be (bila be).

Wekî van, mînak pir in. Divê di zimanê nivîskî de yekîti hebe, peyvên herêmi li ser nivîsarên rojnameyê hatim nebe, ne devoka Serhedê, ne devoka Botan û hwd. Peyva ku bi kurdîya xas be jî divê ji herêmiyê xelasbûyî be.

SABAHATTIN HALLI  
QEREYAZÎ / ERZIROM

**AZADIYA** welat jî du peyvyan pêk hatiye; azadî û welat. Azadî jî dê, bav û evîna dilan jî şîrîntir e. Lê welat?! Welat jî van jî şîrîntir e. Na na azadî û welat, hûn yek jî yekî şîrîntir in. Lê Azadiya Welat (rojname) li ber dilê min bi qasî van herduyan şîrîn e.

Ma em ne ti û birçiyê azadî û welatekî azad in. Ji roja ku em jî dayika xwe bûn he-ta niha ma em ne ti û birçiyê azadiyê û zimanekî azad û welatekî azad in?

Her çiqas bi axaftina zimanê zikmakî devê me şil bibe, tîbûna me bişikê jî, bi zimanê kurdî xwendin û nivisandin tişteki cuda ye. Gava mirov bi zimanê kurdî dinvîsîne xwe azad dibîne, dilgerm dibe, mirov tîbûn û birçibûnê jî bir dike.

BAHATTIN/STENBOL



Zîhniyet

MEHMET GEMSİZ

**P**êşî em bi kurtî û bi awayekî giştî zîhniyetê tarîf bikin. Di ferhengan de wiha hatiye ravekirin: Riya fikirînê, awayê hizirîn û fikirînê. Ewrûpî di şûna zîhniyeta erebî de peyva mantalîte bi kar tînin.

Îcar her civak xwediyê zîhniyetekê ye. Zîhniyeta her civakê bi qonaxa dîrokî ya wê ve eleqedar e. Civakên lipaşmayî, civakên çandîni jî aliyê zîhniyetê ve gelekî li paş in. Zîhniyeta wan ne demokratîk e.

Jixwe devera ku lê çanda demokratîk nebe, ne zîhniyeteke hemdem heye û ne jî metoda ku civak pê dirame pêşketî ye. Ev rewş jî bo kesên raser û rajerên civakê jî wisan e. Ji ber ku civak (awayê birêvebirinê çî dibe bila bibe) bi mejiyên kevn, bi azine û metodên lipaşmayî tê îdarekirin.

Çendî qanûnên ku civak pê hatiye saz kirin û birêvebirin nûjen û demokratîk bin jî, pratîk tişteki din dide nîşan.

Rêveber û rayedarên dewletê, ne bi qanûn û qaydeyan, lê belê bi pejn û hisên xwe biryaran din, tevdigerin. Şêla wan ev e. Keyfiyet raserî her tiştî ye.

Di civakên nûjen de, rola însiyatîfên sivilî, rêxistinên demokratîk ên cemawerî, rewşenbîr û hwd. pir girîng e. Ev wezîfeya çavdêriyê pêk tînin. Hemû tiştên ku di-qewimîn (çî erênî û çî jî neyînî) kontrol di-

kin. Bepirsiya wan ev e û pir jî giran e.

Kesên ku jî aliyê zîhniyetê ve bi pêş ketine, jî encamê bêhtir li ser egeran (sedeman) radiwestin. Wan didin ber hev û jê encameke zanistî derdixin.

Digel van gotinan, îcar ez dixwazim du nimûneyan pêşkêş bikim ku bi zîhniyetê ve têkildar in.

Van rojan peyva "aşî"yê jî demên berê bêhtir hate bilêvkirin. Çendî ku di van rojên dawîn de hinek germahiya xwe winda kiribe jî.

Peyv, di çarçoveya meseleya berdana leşkerên dîl de, ku di destên PKK'ê de ne, kete rojevê. Em dê zêde nekevin nava mijarê, hema bi awayekî bi ser re, nêzîkahi-yê di mijarê bidin.

Li ser vê mijarê İsmail Nacar bi Serokwezîr Necmettin Erbakan re hevdi-tinek pêk anîbû. Der barê vê yekê de hin daxuyanî di çapemeniyê de derketibûn û hêviyek peyda bûbû. Bi berdana leşkeran re wê meseleya aşîyê tam biketa rojevê. Ne-bû. Em kurt bibirin.

Hin kesên ku bi navê aşîxwazi-yê derketibûn holê, bi eynî mesafeyê nêzîkî her du aliyên nedibûn. Di uslûb û zîhniyetê de cudahî hebû. Bi ya me diviyabû ew "kesên aşîxwaz" ku ji wan re "alspiyî" jî tê gotin, tam bêteref bûna. Heke ji bo aliyekî peyva birêz bi kar bîmî û ji bo yê din

neyînî, di vir de zîhniyeteke xerab derdi-keve rastê.

Wiha nabe, eger ji aşîyê bê behskirin, divê bê zanîn ku teref hese û di warê navberiyê de jî bêlayenî esas e. Mirov çî ji aliyekî bixwaze, divê di gerewa wê de jî, ji aliyê din bixwaze.

\*\*\*

Roja 20'ê gelawêjê me li Dadgeha Ewletiyê ya Dewletê (DGM) ya Stenbolê îfa-de da dadger; jî ber axaftina xwe ya li Kongreya Ne-asayî ya HEP'ê, ku di 1991'ê de li Enqereyê çêbûbû. Pêşî em bi madeya 125'an ango bi îdamê darizan-din. Pişt re li madeya 8'an a "têkoşîna li dijî terorê" zivirandin.

Di dawiyê de du sal heps û 100 milyon cezayê pereyan li me birîn. Doz çû temyî-zê. Lê di "qanûna têkoşîna li dijî terorê" de guherîn pêk hatin. Doz jî nû ve hate DGM'ê.

Di vê dozê de kesên wekî Felemez Başboğa, Kemal Okutan, Güven Özata, Feridun Yazar jî hene.

Em, tevî parêzeran (ebûqat) hatin hew-şa dadgehê. Ji girtîgehê jî girti-yên ji çepên Tirkiyeyê anîbûn dadgehê. Gava ku ew girtî ji erebeyê peya bûn, dest pê kirin dirûşma (slogana) "Bijî berxwedana me ya rojîya mirinê" qîriyan.

Vitevit jete leşkeran, fermandeyê wan (ku bi tirkî ji ber başçavuş tê gotin) li leş-keran vegeriya û bi dengêki bilind got:

- A rast ev ne bitalûke ne, ên bi talûke evên li ber diwêr in.

Fermande parêzer destnîşan kiribûn. Yanê vî ji koma me re gotibû. Ev e zîh-niyeta wan.

Çavkaniya sereke ya zimên: Dayik

FEREC KURÊŞIVAN

**L**i ser dîşa zimanê kurdî ku di kî-jan hêlê de bi pêş de çûye ez dixwazim çend gotinan bibêjim.

Berî her tiştî rexneyên ku jî zimanê Azadiya Welat re tînin, ez dixwazim bîbersivînim, lê divê pêşî rexne çî ne, ez wan diyar bikim.

Ev demeke kurt e ku têkilî û pêwendiyên min bi gel re xurt bûne, rexneyek jî wan ew ku zimanê Azadiya Welat zehf akademîk e û jê nayê fêmkirin. Ya din jî, ji hinek xwendevanan tê, divê em li van rexneyan guhdariyê bikin. Ev jî li ser hinek biwêjan e.

Yanê hinek biwêjan ku di hevokan de tîne bikaranîn jî aliyê xwendevanan ve nayên fêmkirin.

Rexne ev in, hema ez dixwazim derbasî bersiva wan bibim. Yek jê, li nik min zimanê kurdî hîn negihîştîye dîşe-ke akademîk. Baş xuya ye ku, akademi-yên kurdan ên neteweyî tune ne. Enstîtuyên kurdan çiqas xebat û lêgerî-nên akademîk dikin, ev dabax jî genge-siyê re vekirî ye.

Bi asanî ez dikarim bibêjim ku, zi-manê rojnameyê reh û kokên xwe jî zargotina kurdî distîne. Bi awayekî ve-kirî ev ew e: Em bi saya xwendevan û xebatên xwe berhemên zargotina kurdî dicivînin, ba hev û em wêjeya gelê kurd

**Biwêjan ku li devera Serhedê tê gotin jî aliye kesên botî ve dibe ku neyê zanîn; biwêjan ku li devera Xerzan jî tê gotin dibe ku li hêla Serhedê neyê zanîn. Dibe ku ev jî bo xwendevanan astengek be. Lê, ji bo hînbûna zimanê kurdî ne astengeke mezin e.**

a devkî digihîjin qada nivîsandinê. Yanê rojname mîna dermoxekê gotinên pêşiyar, tiştonek, metelok, biwêjan gelêrî, serpêhatiyên kurdî didin hev û bi teknîka rojnamegeriyê dixin pergaleke zanistî. Bi vî awayî em malê gelê dîsa bi saya rojnameyê li gel vedigerînin.

Divê em xwe jî bandora devokan xelas bikin; rexneya duyemîn ev bû ku, xwendevanên Azadiya Welat tînin zimên. Xwendevan di bin bandora zimanê herêmi de ne. Bi gotineke eşkere ez vê dibêjim: Biwêjan ku li devera Serhedê tînin gotin jî aliyê kesên botî ve dibe ku neyê zanîn; biwêjan ku li devera Xerzan jî tînin gotin dibe ku li hêla Serhedê neyê zanîn. Xuya ye ku ev jî bo xwendevanan wê bibe asteng.

Lê, ji bo hînbûna zimanê kurdî ne astengeke mezin e. Heger ku rojname jî aliyê xwendevanan ve bê şopandin ev asteng di pêvajoyê kurt de ji holê wê rabe. Divê mirov piçekî hogirî zim-an û berhemên kurdî bibe.

Hînbûna zimanê kurdî ne karekî dijwar e. Bes mirov piçekî bixwaze. Ez bala xwe didimê, ji bo hînbûna zimanê

kurdî astengên ciwan, zarok, jin û mê-ran jî hev cuda ne.

Yek jê, xort û zarok li gorî jek û mê-ran bêhtir nêzîkî zimanê tirkî ne. Sede-mên vê jî, dibistin û çarçemenî di med-ya yê tirk in. Xort û zarokên kurdan çavên xwe vedikin, xwe di vê qadê de dibînin. Êdî hemû tiştî bi zimanê tirkî dihizirin. Mêrên kurd jî li gorî jinên kurd, hîn zêde para xwe ji asimilasyonê standine. Yanê mêrên kurd leşkerî jî tirkan re kirine, piçekî hîn tirkî bûne; rahiştine nivînen xwe derketine metro-polên tirkan jî bo xebatê. Zimanê wan î zikmakî li vir jî xera bûye. Demekê jî mêrên kurd kê biwêjan bi tirkî bixebitanda ew modern û şareza bû, li gorî civakê.

Jinên kurd li gorî mêran, zimanê xwe winda nekirine. Wan leşkerî jî tirkan re nekirine; neçûne dibistanên tirkan jî, bi qasî mêran derneketine metro-polan da ku zimanê xwe winda bikin.

Di nav civaka kurd de hê jî gelek dayikên ku qet bi tirkî nizanin hene. Niha ev dayik in, ji bo zargotina kurdî û berhemên zimên, gencîneyeke dîrokî.





**KOMEK** mafparêzên ku çûbûn serdana Girtîgeha Erziromê, dan zanîn ku greva birçibûnê ya 88 girtîyan ji çil rojî borîye. Heftiya çûyî wan diyar kir ku rayedarên girtîgehê guh nadin peymana ku di navbera girtî û wezaretê edaletê de çêbûbû.

Li Girtîgeha Amasyayê jî zêdetir çil rojan e ku girtî bi eynî daxwazê di grevê de ne. Li ser vê rewşê Komîteya Çavdêriya Girtîgehê xwest ku hikûmet soza xwe bîne cih. Li aliyê din roja 20'ê gelawêjê çar endamên Komîteya Berbendkirina Îşkenceyê ya Konseya Ewropayê ji bo çavdêriya li girtîgehan hatin Tirkîyeyê.



**KÜSTÎNÊN** bêdarizandin lez girt. Piştî ku li Edeneyê du zarok ji di nav de 5 kes hatin kuştin, heftiya çûyî li gelek deverên wekî Amed, Dêrsim û Stenbolê polîsan avêtin ser hin malan û mirovên di hundir de kuştin. Wekî mînak li Dêrsimê Mazlum Mansuroğlu (24), li gorî fîdaiyan pêşî jî aliyê tîmên taybet ve hatîye girtin, piştî re hatîye kuştin.

Her wiha li Eyûba Stenbolê hêzên dewletê avêtin ser mafekê û du kesên bi navê Senem Adalî û Muhamed Kaya kuştin. Hate gotin ku ev du kes bi destê hêzên dewletê hatine înfazkirin.

## NÛÇE

# Bêyî kurdan çareserî tune



**Piştî ku Tirkîyeyê ew çend pesina da, MED-TV'yê careke din dest bi weşana xwe kir. Serokê Giştî yê PKK'ê ji bo aştîyê zor dide Tirkîyeyê da ku gaveke bi pêş de were avêtin. Ji fermanarên ARGK'ê Osman Öcalan tevî salvegera pêncî salî ya PDK'ê bû û vê yekê Enqere hejand. Hêzên PDK û YNK careke din dest bi şer kirin.**

**E**v du hefte ne ku gelek rûdan û qewimînên di warê siyasetê de, rojeva Tirkîyeyê û ya kurdan germ kirin. Piştî ku Tirkîyeyê ew çend pesina xwe da, MED-TV'yê careke din dest bi weşana xwe kir... Serokê Giştî yê PKK'ê ji bo aştîyê zor dide Tirkîyeyê da ku gaveke bi pêş de were avêtin. Wê li hemberî wê yekê jî 8 leşkerên Tirkîyeyê yên girtî, ku di destê PKK'ê de ne, werin berdan... Ji fermanarên ARGK'ê Osman Öcalan tevî salvegera pêncî salî ya PDK'ê bû û vê yekê Enqere hejand... Hêzên PDK û YNK careke din dest bi şer kirin...

### 15'ê gelawêjê, Serokê PKK'ê û çapemenî

Roja 15'ê gelawêjê bi munasebeta salvegera 12 saliya destpêka şerê çekdarî ya PKK'ê, Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di MED-TV'yê de pirsên rojnamevanan ên ku beşdarî programa MED-TV'yê bûbûn, bi rîya telefonê bersivand. Öcalan piştî ku wekî her car got: "Em ji bo aştî û çareserîkirina siyasî amade ne", li gotina xwe ev zêde kir: "Me îro li gerilayên xwe bang jî kir. Ji bo ku rê li ber çareserîkirina siyasî vebe, me bi dorfirehî û birêkûpêk xwe amade kiriye. Hêzên me yên gerîla, ne tenê li herêmên kurdan, li metropolên ku dikarin xwe bigihîjin jî, wê livbaziyan pêk bînin. Li bajaran livbazî wê zêdetir bibin. Ez naxwazim bikevim binê wê berpîrsiyê, lê heger bi ser me de werin, emê jî heta dawiyê xwe biparêzin. Min vê gavê dixwest ku qasidên cidî bixistana navberê da ku me dest bi van livbaziyan nekira. Ku ji bo aştîyê ew bi rastî gaveke bi pêş ve biavêjin, em dikarin nehêlin ku yek fişkek jî biteqe."

### Gavêk ber bi aştîyê: Berdana leşkeran

Öcalan diyar kir ku di nava Refahê de yên

ku li dijî şerê taybet in, yên ku li dijî Rêveberîya Taybet in, yên ku li rîya çareserîkirina çekdarî bawer nakin jî hene. Yên ku ne li dijî çareserîkirina siyasî ne jî hene. Her wiha Öcalan got ku, di demên dawîn de kesên ku xwestin gavekê biavêjin, ji aliyê serkanên şerên taybet ve, dengê wan hate birîn. Ji ber vê yekê jî ew nikarin bibêjin ku Refah bi temamî dixwaze di bin siya şerê taybet de bimeşe. Piştî van gotinan Abdullah Öcalan ji Erbakan re nameyê vekirî jî şand û got ku ew li hêviya bersiva wê nameyê ne û ji bo nîşandayîna niyeta wan a baş jî, wê 8 leşkerên ku di destê wan de ne berdin.

Lê belê li gorî nûçeya DEM Ajans'ê ku di 20'ê gelawêjê de belav kir, ji ber ku ji Tirkîyeyê bersivê jî PKK'ê re nehatiye dayîn, wê leşkerên Tirkîyeyê jî neyên berdan. Vêga malbatên leşkeran û heyeta ku leşkeran teslim bigirin haziriyên xwe dikin û li hêviya bersiva PKK'ê ya erênî ne.

### Bêyî kurdan zîrveya çaran!

Her wekî tê zanîn Wezîrê Edaletê Şevket Kazan û Wezîrê Perwerdehiya Neteweyî Mehmet Sağlam berî demekê çûbûn Iraqê da ku, di navbera Iraq, Sûriye, Îran û Tirkîyeyê de îtifakê çêbikin û problema xwe ya bingehînan yanê pîrsgerîka kurdan, bi awayekî çareser bikin. Her çîqas di vê seredanê de li ser hin mijaran bi Iraqê re li hev hatin jî, lê li ser zîrveya çaran ku Tirkîyeyê dixwest pêk bîne, negihîştin encamekê.

Abdullah Öcalan di axaftina xwe ya MED-TV'yê de li ser vê mijarê jî sekinî û got: "Di dîrokê de hin îtifakên çaran hene, mîna Pakta Bexdadê, Pakta Sadabatê û hwd. Vêga jî difikirin ku bi vê îtifakê li dora pîrsgerîka kurdan çeperê deynin. Lê rastiya van her çar dewletan jî hev cihê cihê ye. Heta problemên her dewletekê jî wan, bi her sê yên din re

hene. Wekî berê ne mimkûn e ku çeperê li kurdan teng bikin û kurdan tasfiye bikin. Eger îtifakê were avakirin jî di navê de wê kurd jî cih bigirin. Heta PKK jî wê cih bigire. Bêyî PKK'ê kirina politikayê gelekî zehmet e. Bêyî PKK'ê politikakirin, tê maneya ku dewletên din jî wê têkilî vî şerî bibin. Ez eşkere bibêjim ku; ne Îran, ne Iraq, ne jî Sûriye, vî şerê ku Tirkîye dimeşîne, li ber çavan nagirin û menfaeta wan jî tune tê de."

### Nêzîkahiya PKK'ê û PDK'ê

Di 19'ê Gelawêjê de ji bo salvegera pêncî salî ya PDK'ê li bajarê Selahedinê şahiyek hate lidarxistin. Birayê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, Osman Öcalan jî di protokolê de cih girt. Ji ber vê yekê jî siyasetvanên Tirkîyeyê rabûn ser piyan.

Ji bo ku Tirkîye rê li ber nêzîkbûyîna PKK'ê û PDK'ê bibire, di 20'ê Gelawêjê de di bin serokatiya Wezîra Karên Derve Tansu Çiller de civîneke taybet pêk anî. Piştî civînê Tansu Çiller daxuyand ku, kî destê "terorîstan" bigire wê destê wî were şikandin û kî ku nêzîkahiya li "terorîstan" bike, wê were cezakirin!

### Şerê li navbera PDK û YNK'ê

Ji meha Avrêla 1996'an û vir ve di navbera PDK û YNK'ê de agirbestekê berdeham dikir, lê di 18'ê gelawêjê de ev agirbest xera bû, careke din şerê navbera wan dest pê kir. Li gorî agahiyên ku ketin destê me heta vêga hejmara kesên ku hatine kuştin bi sedan tînin ifadekirin û gelek birîndar jî hene. Wekî her carî PDK û YNK'ê wê carê jî hev û din sûcdar dikin û dibêjin aliyê din bûye sebeb ku ev şer dest pê bike.

NAVENDA NÛÇEYAN

## DIK

### Anîtkabir hejiya!

Ji bo gelek dewletên herêma Rojhilata Navîn, kêfxweşiya du kurdan ji hev re, gunehkariyê mezin e. Dema du kurd li ba hev rûnin, mû li laşê wan dibin dirî, dibin strî...

Heta ku dinya ava be lazim e piştî kurdan li hev be. Dema ku li hev bizivirin jî, divê di destên wan de, xencerên dudev hebin ku pê singên hev biqelêsin, dilên hev derxin, bixwin...

Du kurd bi çavekî baş li hev binêrin!

Çênabe...

Xwedê jî qebûl nake...

Zilmeke zor...

Neheqiyê mezin el

Ji bo salvegera pêncî salî ya PDK'ê ku birayê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, Osman Öcalan tevî şahiya PDK'ê bû, Tirkîye wekî dewê di nava meşkê de li hev ket, kêliya... Û dinya jî di sisûmeke mezin de kêliya... Qama hinekan şikest! Çavên Zeyneba Zer çûn piştî serê wê! Na, li piştî serê wê nese kinîn, ji wir jî berjêr bûn bi xwar de, hin bi xwar de...

Di dawiyê de qiymet rabû!

Heta ku Anîtkabir jî hejiya!

RAHMÎ BATUR



# Di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de ÎBLÎS

**Ehmedê Xanî neçûn sicûdê bi cebriyetê ve girê dide, ango Îblîs li gorî viyana Xwedê ya ezeli mecbûr bû neçe sicûdê. Xwedê ji ezel de ev yek viyabû û nivîsîbû. Di gel ku Xwedê ferman kir û got "iscidû li Adem" yanê ji Adem re secde bibin, wî ev yek ji Îblîs nedixwest.**

JAN DOST

**D**i dîroka fikra îslamî de pîrsa Îblîs cihekî girîng standiye û gelek muteseûf û filozof û zanyaran behsa vê pîrsê bi firehî kirine.

Ehmedê Xanî ku yek ji rewşenbîrên mezin ên sedsala 17'an bû, wî jî di Mem û Zîna xwe de dewla xwe berdaye vê bîrê.

Her çendî ku nêrînen der barê vê pîrsê de cur bi cur in jî, nêrîna seydayê Xanî nêrîneke cihê û cuda ye ji nêrînen filozofên berî xwe.

Di pêşgotina Mem û Zînê de ya ku ji 188 malikî saz dibe û di malikên 85, 86, 87, 88'an de Xanî dibêje:

*Îblîsê feqîrê bêcinayet/ hindî te hebû digel inayet*

*Her rozi dikir hezari taet/ lewra ku te da wî istîtaet*

*Wî secde dekir li xeyrî mebûd/ gêra te ji ber derê xwe merdûd*

*wî secde nebîr li pêşiya exyar/ qehra te kire muxeledunar*

Ango: Îblîsê feqîr û bêguneh, gava te ew perwerde dikir.

Rojê hezar nimêj û perestî dikir, ji ber ku te qewet û hêz da wî. Wî serê xwe dananî erdê ji xeyrî Xwedê re, te jî ew ji ber deriyê xwe dût xist.

Ew neçû sicûdê ji xeyrî te re, xişm û xezeba te ew her di agir de (dojhê de) hişt.

Nexwe Ehmedê Xanî neçûna sicûda Îblîs ji Adem re, bi tewhîd û cebriyetê ve girê dide, Îblîs xwedayekî tenê nas dikir û wî hîç nedikarî ji derveyî viyana Xwedê bilive. Rast e ew li ber fermana Xwedê (uscidû li Adem: ji Adem re herin secde) rabû, lê ev yek bi vîn û îradeya Xwedê bû, ji ezel de Xwedê ev neçûna secde viyabû, îcar Îblîs bû qurbana dijberiya ferman û viyanê. Fermanê digot:

"Herin sicûdê" û viyana Xwedê digot:

"Bila Îblîs neçe sicûdê."

Wekî me di serî de got, vê pîrsê bala gelek filozof û mutesewûfên îslamê kişandibû, hinan gotin sedemê neçûna sicûdê nezaniya Îblîs bû û Qurana pîroz dibêje:

Sebeb xwebîniya Îblîs e ango agir ji axê çêtir didît, ew ji agir bû û Adem ji

axê; di nêrîna wî de ne durist e agir serê xwe ji axê re deyne.

Û hinan wekî Ferîd Eldîn El Ettar yê farisî û xwediyê destana Mentiql Teyr digotin:

Îblîs neçû sicûdê da ku binêre Xwedê çawa can berdide laşê Adem û dema Xwedê nas kir ku Îblîs raza jiyane fêm kir, ew ji ezmanan daxist û lanet lê kir.

Ibn Erebi ku yek ji mezintirîn muteseûfên îslamê ye, ev mesele bi nezaniyê ve girê da; ew di helbesteke xwe de wiha dibêje:

Eger Îblîs di Adem de ronîya rûyê wî (ango Xwedê) bidîta tu carî serkêşî nedikir.

Şairê kurd ê mezin Melayê Cizîrî eynî gotinê dibêje:

Ger di Adem bidîya Sirê ilim Iblîsî  
"Hînama ebserehû kebber hînan we secde"

Ango: Eger Iblîs raza zanistiyê di Adem de bidîya wê çûbûya sicûdê dema ku çav lê biketa.

Nêrîna Huseyîn Mensûrê Hellaj (Halac), der barê vê pîrsê de xwediyê nêrîneke taybet e. Ev neçûna sicûdê bi du sedeman ve girê dide: Yek ji wan hezkirina Îblîs ji Xwedê re, yê din tewhîda mutleq ango yekirina Xwedê. Hellaj li ser zimanê Îblîs dibêje:

Eger Xwedê min bi agirê xwe biazi-rîne, heta û heta, ez serî ji kesî re danayim, ....., doza min doza rastgoyan e û ez di hezkirîne de rast im.

Û dîsa dibêje:

Jê re got: Ey Kêmo tu naçî sicûdê? got: Ez evîndar im û evîndar xwe her kêman dibînin.

Ne bes wiha, Hellaj dibêje ku Îblîs mamostayê wî ye di tewhîdê de, (hevalê min û mamosteyê min, Îblîs û firewn in, tehdîda agir dane Îblîs û ji ser ya xwe daneket.)

Îblîs di nêrîna Hellaj de sofîyekî ku bi hezar salan bi Şihûd El Heq mijûl bûbû, ango ew di dîtina Xwedê de mabû. Wî ji Xwedê pê ve nexwest ji tu kesî re here secde. (Îblîs ji Mûsa re got: Doza Xwedayekî bi tenê nehişt ez herim sicûdê.)

Her çendî ku Ehmedê Xanî jî piştgi-riya Îblîs kiriye jî lê ew nagihîje paye-ya Hellaj di piştgiyariya Îblîs de, ji ber ku nêrîna Xanî li pîrsa neçûna sicûdê, cu-



da ye ji nêrîna Hellaj.

Ehmedê Xanî neçûna sicûdê bi cebriyetê ve girê dide, ango Îblîs li gorî viyana Xwedê ya ezeli mecbûr bû neçe sicûdê, Xwedê ji ezel de ev yek viyabû û nivîsîbû.

Di gel ku Xwedê ferman kir û got "iscidû li Adem" yanê ji Adem re secde bibin, wî ev yek ji Îblîs nedixwest. Xwedê zanîbû Îblîs wê serkêşiyê bike û fermana wî napejirîne. Di navbera fermana Xwedê û viyana Xwedê de, Îblîs bû qurbaneke neçar, çî bû ne bi destê wî bû. Û neçûna sicûdê ne serkêşî bû, lê bicihkirina viyana Xwedê ya ezeli bû.

Di gel ku Xanî xwestiye eşkere piştgi-riya Îblîs bike, lê em dinêrin ew hêdî hêdî ji doza xwe vedigere û ji Xwedê rica dike ku tenê Îblîs têxe nava agirê cehnemê û ademîzadan hemûyan ji agir bi dût xîne, ji ber ku wan çî kirin ne bi destê xwe kirin: Ew dibêje: ji malika 186'an

*El qisse bikî ku dêwê serkêş/ تنها û tenê biçite ateş*

(Tu bihêlî tenê şeytanê serkeş, biçê nava agir)

Lê em dikarin bibêjin ku Xanî dîsa ev doz ne ji dil digot û Xanî tu guneh li

dor Îblîs nedîtî û ew layiq û sezayî agir nedidît, û bêguman eger kilîta bihiştê di destê Ehmedê Xanî de bûya wê berî her kesî Îblîs derbasî cenetê kiribûya, ji ber ku di dawîya Mem û Zînê de, em dibînin Bekoyê Ewan ê ku ew qas xerabî û fitne û fesadî kirin (1) di bihiştê de bûye dergevanê seraya her du vîndaran.

Û wekî Dr. Îzzedîn M. Resûl dibêje: Xanî serencama Bekir ji Îblîs re jî dixwaze û bêguman dixwaze tu ademîzad cehnemê nebîne; ji ber ku çî dibe, ne ji derveyî viyana Xwedê ye.

## Çavkanî:

1. Dîwana: tercuman el Eşwaq, Ibn Erebi.

2. Tewasin: Mensûrî Hellaj, lêkolîna Louis Massignon, Paris, 1913.

3. Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Şîrovekirina bi erebî, J. Dost, 1995.

4. Ehmedê Xanî, Dr. Îzzedîn M. Resûl, rûpel 305, Bexdad.

(\* Xanî li ser Bekir wiha dibêje: *Şagirdê şeameta wî şeytan Şermende ji gotina wî Bohtan!!* Îcar eger mamostayê Îblîs biçê bihiştê

Cîma wê Îblîs biçê dojhê?



# Dahûrîna peyvan (3)

**E**m dê, di vê rêzenivîsa xwe ya sisiyan de, xebata xwe ya li ser dahûrîna peyvan bidomîn. Mebesta me vê gavê ne ew e ku em hemû peyvên di kurdî de (qest ji kurmançî ye) bidine ber xwe û wan dahûrînin.

Çendikên ku di jiyana rojane de pir dertên pêşiya me, niha zêdetir bala me dikîşînin ser xwe. Yek ji wan peyvan jî "tune" ye, ku di wateya "nîn" de tê bikaranîn.

**Tune:** Em vê bibêjin ku warê bikaranîna wê peyva hevedudanî pir in. Her wiha, digel vê rewşê jî peyveke wisan e ku ji aliyê teşe û dirûvê ve xerabûyî ye.

Me li jorê jê çêl (behs) kir ku ew peyveke hevedudanî ye. Îcar em li ser dahûrîna wê rawestî û lê bixebitin da ku em hêmanên wê ji hev bikin.

Peyv ji du hêmanan (bi halê xwe yê "tune") pêk hatiye; ji "tu" û "ne"yê. "Tu" di wateya "hiç", "kok", "ter" û "qet"ê de ye, ku li hin herêman "tu" wekî "çu" û "çî"yê jî tê bikaranîn. "Ne" jî qertaşa (pirtika) neyîniyê ye. Çawa? Em wê jî rawe (îzah) bikin. Ji ber ku têkilî bi lêkera "hebûn"ê heye.

**"tune" teşeya xerabûyî ya "tu neheme"yê ye. Bi qonaxa demê re dageriyaye û êdî wekî "tune" derketiye holê. Her wiha, wisa bûye ku bi awayekî kurt di şûna ku "ez tu neheme", bê gotin de, "ez tune me" tê gotin.**

Em lêkerê serê pêşî bi raweya erênîyê bikişînin.

*Ez heme, tu heyî, ew heye, em hene, hûn hene, ew hene.*

Îcar bi raweya wê ya neyîniyê.

*Ez neheme, tu neheyî, ew neheye, em nehene, hûn nehene, ew nehene.*

Piştî van em "tu", "hiç" an jî "qet"ê di rewşa neyîniyê de bi kar bin.

*Ez hiç neheme, ez tu neheme, ez qet neheme...*

Tê zanîn ku li Bakur, bi taybetî ji bilî herêma Botan "tu" û "qet" tê bikaranîn. Li vir divê bê eşkerekirin ku "qet" peyveke erebî ye û ketiye nav zimanê me. Lewma li Botan bêhtir ji dêla "tune"yê "tu nîn e" an jî "çu nîn e" tê bikaranîn.

Wekî ku me daxuyand, "tune" teşeya xerabûyî ya "tu neheme"yê ye. Bi qonaxa demê re dageriyaye û êdî wekî "tune" derketiye holê. Her wiha, wisa

bûye ku bi awayekî kurt di şûna ku "ez tu neheme", bê gotin de, "ez tune me" tê gotin.

Pêwîst e ku em li ser çend xalên din jî rawestî. Li hin deveran (wekî Amêdê) peyva "nîn e" di cihê "ne"ya neyîniyê de tê bikaranîn. Bi ya me, li gorî gramera zimanê me, ev yek ne rast e.

Nimûne: *Kesên ku hatine ba me şoreşger nîn in.* Li vir mebest ne nînbûna (tunebûna) şoreşgeran e. Hevok divê wiha bûya:

*Kesên ku hatin ba me ne şoreşger bûn.*

Em vê jî bibêjin, li hin deveran (mînak Semsûr) "nîn e", wekî "nîn e" tê bilêvkirin.

Di zaravayê kirdkî (kirmancî, dimilkî, zazakî) de jî wekî kurmançî, di şûna "nan tune ye" ye de "non çinî yo" tê bikaranîn. Li vir "çî"ya di "çinî yo" de, "çu" an jî "tu"ya kurmançî bi xwe ye.

Piştî van daxuyaniyan, em bi hêsanî vê bibêjin ku "tune" ne peyveke xwerû û sade ye. Peyveke hevedudanî û xerabûyî ye.

Bi ya me; gere "nîn" şûna "tune"yê bigire.

Li hin deveran (wekî Agiriyê) di şûna "hene" de "henin" jî bo pîrejîmariyê tê gotin. Ev jî ne rast e. Ji ber ku kok "he" ye. Li hêla din, gava ku peyv bi dengdarekê biqede, ji bo yekejimariyê qertafên "me", "yî", "ye" û ji bo pîrejîmariyê jî "ne" tê dawîya peyvê.

Nimûne: *ez he+me, tu he+yî, ew he+ye, em he+ne, hûn he+ne, ew he+ne.*

Her çendî li gorî qeydeyên rêzîmên diviyabû ew jî hev cuda bihatana nivîsîna jî îro di pratîkê de, di warê nivîskî de bi hev ve tîn nivîsin.

Îcar gava ew kesên ji wan deveran "tu"yê jî pê ve dikin, wiha dibêjin "tunin" jî bo pîrejîmariyê. Heke em "tune" kok bipejîrin, diviyabû me bigota "tune ne", ji bo pîrejîmariyê.

Çawa me li jorê jî got, "tu" di eslê xwe de cînavkeke nebinavkirî ye.

ZANA FARQÎNÎ

## Li Berlînê jiyana epîk

FAYSAL DAĞLI



**D**ema rûyê esman tarî dibe û roj li paş xwe rêçeke rengîn dihêle û dikeve bergehê, diçe ava, li Berlînê perdeya jiyane ya duyemîn dest pê dibe. Li vê paytexta betlandî ya şaristaniya Ewropayê ev perdeya ku bi tîrêjên sônî tê ronîkirin, wekî lîstikeke şanoyê ya epîk e.

Bajar bi roniyên rengîn û bi dekorên bineqş xemilandî ye. Lîstikvan piranî ne ji vî bajarî ne. Sêwîtiya perdeya yekemîn ji ser xwe avêtine.

Niha bêhtir hosta ne û pirtir, xwe radigirin. Ji wan ên ku, li ronîya tava bajarê dawiyê tînin, cudatir in. Pirên wan, zimanê almanî bi devokan xeber didin. Ji wan hinek jî, vî zimanî qet nizanin, xwe bi bêje yên ku ji welatê xwe anîne îfade dikin. Nûner, li Berlînê û perdeya wê ya duyemîn bi sebat û bêdengîyeke kûr temaşe dikin. Ev lîstikekî epîk e. Mirov hem dilfîzin û hem jî temaşe dikin. Lîstikvan ji ber rolên xwe yek yek dikevin mekanê û dertên. Rengên çermên wan cur bi cur in. Ev, dirûvê wan ê tabî ye. Her yekî bi xwe kostûmên xwe tesbît kirine.

Serkar tune ye; bi tenê destpêk û dawî heye. Doktirîn a Brecht derbas dibe, ku ew çend kilometre ji dûr ve li Berlînê dinihêre. Temaşevan û mekan û lîstikvan tev di nav hev de ne. Lîstik li jiyane, jiyana li lîstikê û ev jî li perdeya duyemîn a Berlînê hatiye lêhanîn. Her yek replîkên xwe diafirîne. Niqta gîhanê ya tîp û karakteran ew e ku, li mekanê Berlînê ne û qasî awireke bihêrs nêzî hev û bi qasî du evîndaran jî durrî hev in. Vî mesafeyî jî ew bi xwe tesbît dikin. Roj, ber bi bajarê parzemîneke din ve diherike.

Ev îşareta destpêka lîstikê ye. Ji Meydana Aleksander, ji Zooyê, ji Kotiyê, ji Hermanplatzê, lîstikvan cihê xwe li qinaypeyan (meyxaneyên

almanî) digirin. Li her maseyekê çend lîstikvan hene. Garsonên çermzer, esmer an jî reş bi bédengî û bi kubarî, pîrsa navê vexwarinê dikin.

Ev jî îşareta destpêka gotinê ye. Belê diyalog û replîk cur bi cur in. Tekstêkî nivîskî tune ye. Lîstik wê ji cihê ku ji do mabû, bidome. Vaye nivê Berlînê ku di nava sosyalîzmê de jiyaye û va ye xelata wan a ji rûniştvanên bajêr re; qûleya TV'yan a bi nav û bilînd. Qinaypek li bin vê qûleyê ye. Galegalekî wîetnamî, di fonê de, gîtarîstekî lafînî ku Rodrigo dilezîne. Şeş cot çavên gumandar, du jin. Mijar, xesilata firotina cixareyên kaçax, teqizandinên polîsan û metodeke li dijî dertixûbîkirinê ye. Her şeş jî zarokên karkerên komunist ên Wîetnama Hoşîmîn in. Ew bi salan berê bi hezaran kilometre ji durrî hatine, ji bo ku vî bajarê ku di bin lingên artêşên Hitler û mutefîkan de peşîbû ji nû ve ava bikin. Ew tevî dê û bavên xwe heta dema dawiyê li cem hevalên xwe yên Rojhilat sekinîne, lê piştî daqurtandina Rojhilat, bi tenê bi serê xwe mane.

Rejîma alman, bi hikûmeta Honaî, peyman a vegeandina çil hezar karkerî daye qebûlîkirin. Berî ku bîna Berlînê, wîetnamî, ji ber ku zanin êdî ji welatê xwe re jî xerîb in û li wir pîrsên girîngtir li benda wan in, dixwazîna serûberî ya xwe ya ku bi salan berê afirandine, biparêzin. Wîetnamiyên Meydana Aleksander, ku demekê ji bo rizgariya welatê xwe canên xwe dane, niha jî bi zorê bi şûn tîn şandin wî welatî.

Epîk didome. Qinaypeyekî din, lê mekanekî ne pir cudatir. Taxeke din. Navê xwe Zoo an jî Chelotenburg e. Vê carê çend mase bi hev re salonek tijî mirov. Ji xeberdanên wan tê fêmkirin ku, ji axa windayî, ji Yûgoslawiyaya wextekî ne. Di fonê de, hinek notayên ji orkestrayekî rîtmîxerab belav dibe. Jineke stranbêj bi axînen xemgîn li guhdaran temaşe dibe. Hemû bihêrs in. Munaqesheyên bi dengê bilînd, û bêhn û efsûna alkola ku bêjeyên tuj nerm dibe... Randevûya wan jî, ya ku wê van deveran biterkînin nêzîk dibe. Jixwe rengê jiyana wan bi domkirina şer ve girêdayî ye. Bi şertê ku piştî peyman a aştiyê bîna zivîrandin, li wir in, ji ber vê yekê bihêrs in û pîrê wan naxwazîna şer biqede.

Di pêvajoya domkirina şer de, wan li Almanyayê jixwe re serûberiyek (pergal) ava kiriyê û naxwazîna ew xera bibe. Ê ku ji vegeerê re bédil in, pir bihêrs in. Hêrsa xwe tenê karin ji şuşeyên alkolê û ji serê hev û du derxin. Bêçaretî û aştiya mitleg hêrsa wan dikîşîne. Di rûyê her lîstikvanê de betilandinê çend emran û êşa ku ji jiyane li para wan ketiye, tê dîtin.

Li Berlînê, govenda ronîyan û şewata gewriyan ji bêhna 'şaristaniyê' ya bixof didome. Hêj ji şeveqê re gelek heye. Lîstikvan car caran cihê xwe diguherin, lê her yek di jiyana xwe de û di çembera qedera xwe de rolê xwe didomîne.

Va ye hinek mirovên esmer û çîroka wan a kin. Mal û gundên pîrê ji wan bi çekên Almanyayê hatine şewitandin û di canên wan de rêçên qulên polayê Bayverayê heye. Mirov û ezîzên xwe ji ber sedemên bi terciha wê dewletê dane axê.

Cihên ku hatine, her tiştî bi daxwaziya jiyaneke wekî ya neteweyên din dest pê kiriyê. Navê welatê wan û zimanê wan jî qedexe ye. Navê ku dixwazîna, nikarin li zarokên xwe deynin û bi zimanê ku ji diya xwe hîn bûne nikarin xeber bidin. Roj tê, li welatê wan tofan ra dibe, û xortomekî (bager) cenaweran her tiştî û herkesî dide ber xwe, li her derê û li her qasî xera dibe, dişewitîne û wînda dibe...

Kurdên Berlînê esmerê ku ji xortomê filitîne. Niha li vî bajarê bisebiqê, xewnên wan bikabû û xewên wan bîminet in. Dewleta alman wan bi avêtina ber lepên xortomê tehdît dibe. Kurdên Kotiyê, Neukolnê û hemû taxan, li ser derketina ji quncikên ku ketinê ne, difikirin. Û yên din, lîstikvan û temaşevanên din: Afgânî, sûdanî, polonî, romen, kubayî, karkerên tirk, konferansvanên profesyonel, çeteyên mafên mirovan, agahkerên penahendeyan, esrarkêşan, fahişeyan, mexlûqên ku cesedên mirovên xwe bazar dikin, ên ku li pey xeyal û hêviyên xwe digerin... Epîka Berlînê, piştî temaşekirina dorgerandina rojgêra me, dewrî êvareke din dibe. Mirovên spî ji xewa xwe hişyar dibin û niha ji kuçeyan ew dagir dikin. Berlîn berê qaska xwe diguherîne, ku rûyek biken, ê din bi girî ye.



# Di helbestên Melayê Cizîrî de

## huner

Hinek hunermend hene ku di dilê civakê de cih digirin û hetanî bi sermedî, di hemû war û demên jiyânê de di dilê civakê û di sînga mêjûyê de cihên xwe diparêzin û her tim taze û nûjen in. Bi sedan sal jî di ser berhemên wan re derbas bibin, ne xem e. Yek ji van hunermendên gelê kurd ên nemir, Melayê Cizîrî ye.

**B**êguman ji xwediyê her berhemeke hunerî re "huner-mend" tê gotin. Vêca di warê jiyânê de ev berhem çî dibê bila bibe, ji naveroka xwe tişteki winda nake, berhem huner e û xwedî jî hunermend e.

Bi kurtayî peyva huner ji layê naveroka xwe ve berfireh e. Her kesekî ku helbestekê darêje, yan romanekê pêk bîne ji wî kesî re hunermend tê gotin. Digel wisa jî huner di ser huner re û hunermend jî di ser hunermend re heye. Ango her hunermendek, li gorî berhema xwe çî di nav civakê de, çî jî di mêjûyê de cihêkî xwe yê taybet heye.

Hinek hunermend hene ku di demêke kurt de deng didin û ji layê civakê ve zû tene naskirin, lê her wisa zû jî tene jibîrkirin û careke din di bûçûna demê de ji layê gel ve nayêne yadkirin.

Belê hinek hunermend jî hene ku di dilê civakê de cih digirin û hetanî bi sermedî, di hemî war û demên jiyânê de di dilê civakê û di sînga mêjûyê de cihên xwe diparêzin, her dem taze û nûjen dimînin. Bi sedan sal jî di ser berhemên wan re derbas bibin ne xem e, digel teknolojiya xwe, mirovayefî çend bi pêş dikeve bila bi pêş bikeve dîsa jî ne xem e, berhemên hunermendên wisa, her tim taze û nûjen in û bi gel re dijîn.

Vêca, wekî tevaya gelên cihanê, gelê kurd jî gelek hunermendên hêja ku tu carî nayêne jibîrkirin, afirandine. Yek ji van hunermendên gelê kurd ên nemir, Melayê Cizîrî ye.

Di vê babetê de daxwaza min tenanet ji layekî ve danasîna hunermendiya Melayê Cizîrî ye. Helbet danasîna Melayê Cizîrî û hunermendiya wî wisa bi çend gotinan û bi çend gotaran wê her netemam be. Çimkî ji bo nasîna Melayê Cizîrî û hunermendiya wî ya di helbestê de, lêkolîneke berfireh û hûr û kûr divê.

Di avakirina helbesta Cizîrî de çî amîrên (hacetên) girîng ku hene, gava ku ji hemû liyan ve (di avakirina helbestê de hîlbijartina peyvan, kilîşeya helbestê, kêş û rêzbenda helbestê, ten û bedena helbestê, wêneyê helbestî û hwd.) bêne wanekirin, dibe ku wê hingê Melayê Cizîrî û hunermendiya wî bê nasîn û hingê emê zanibin ku çima di nav gelê kurd de ji bo Melayê Cizîrî "Şahsuwarê helbesta kurdî" tê gotin.

Bêguman tevaya helbestvanan li ser jimara movikan (kîte) helbesta xwe dirêsin. Ev rêçik ji bo tevaya helbestvanên ku helbesta klasîkî pêk tînin derbas

dibe. Lê pêkanîna helbesta klasîkî li ser bîngeha deng, jimar û bizavê, li dûv agahiya min, di Rohhilata Navîn de tenanet di helbesta klasîkî ya kurdî de heye û wê jî bi Melayê Cizîrî dest pê kiriye û bi Ehmedê Xanî hatiye domandin. Hêjayî gotinê ye ku Xanî digel çarînen xwe, Mem û Zîna xwe jî seranser li ser rêçika Cizîrî pêk aniye. Her wisa gelek helbestvanên kurd ev rêçik bi kar anîne û gelek helbestên xwe bi vî rengî ristîne.

Vêca berî ku em li ser hunermendiya Cizîrî ya di helbestê de rawestînin, ji bo serwestbûna xwendevanan min divê derbarê rê-

çî-  
k a  
k u  
Cizîrî  
bi kar  
aniye de,  
hinek agahi-  
yan bidim.

Her wekî ku tê zanîn di alfabe ya kurdî de heşt dengê hene. Ew jî ev in:

a, e, ê, î, î, o, u, û  
Ev tîpên dengêr di nav xwe de li ser du dangan dabeş dibin.

Tîpên dengnizim û tîpên dengbilind.

Tîpên dengnizim: e, î, u  
Tîpên dengbilind: a, ê, î, o, û  
Tîpa "û"yê pîrf caran di axaftinê de bi duristî dengê nizim dide.

Pîştî vê daxuyakirinê bi kurtayî, vêca emê bêne ser helbestên Cizîrî ku çawa helbestên xwe li ser dangan ristîne. Wekî:

Ger çî bilbil cewherê zatê gul e  
Lê gulê rewneq jî eşqa bulbul e

Her rêzeke vê helbestê  
ji yazdeh dangan pêk  
hatiye û di her rê-  
zekê de sê den-  
gên nizim û  
heşt den-  
gên bi-  
lind he-  
ne.  
Mo-  
vi-

wê bi bulbul ra dixûnit bulbul e  
Sunbula seywan li demê taze kir  
Afîtab îro di burca sunbul e  
(...)

Ev helbesta Cizîrî ya ku jî sêzdeh malikan pêk hatiye seranser bi vî rengî ye. Ji rêza yekê, movikên 2, 6, 10'an, ji rêza duwemîn jî movikên 2, 6, 10 û 11'an dengnizim hatine.

Ji helbesteke din a Cizîrî:

Îro ji derba xencerê  
Lazim bi êşanî Mela  
Teşbîh e zulfâ dîlberê  
Zanim perîşan î Mela

Her rêzeke vê helbestê jî ji 8 movikan pêk hatiye û di her rêzekê de movika sêyemîn û ya heftemîn dengnizim hatine.

Berdewama helbestê:  
Zanim perîşan î ji dil  
Bêhed bi êşan î ji dil  
Teşbîh e buriyan î ji dil  
Billah ne însan î Mela  
(...)

Heger em malikekê bi vî rengî li xwarê bidin xuyakirin, wê hîn çêtir ron û diyar bibe.

Zanim perî/ şan î ji dil  
Bêhed bi ê/ şan î ji dil  
Teşbîh e bur/ yan î ji dil  
Billah ne însan î Mela..

Gava ku wisa li ser pêlikan bê dabêşkirin, xuya dibe ku di her pêlikekê de kîta sêyemîn dengnizim tê.

Ev helbesta ku ji 16 malikan pêk hatiye, ji bilî hinek awarteyan, seranser bi vî rengî ye.

Dîwana Melayê Cizîrî ya ku rêzdar Zeynel Abidîn Zinar berhev kiriye, ji 122 helbestan pêk hatiye. Ji bilî her du helbestên ku Melayê Cizîrî digel Feqiyê Teyran û Mîr Îmadeddînê Botî avêtine ber hev û ji bilî helbesta wî ya ku bi zîmanê Farisî darijtiye, tevaya helbestên wî bi vî rengê ku li jorê bi çend nimûneyan me dane xuyakirin, hatine rastin.

Bi vê pevêka (hevok) helbestvanê kurd, mamosta Enwer Mayî, ez dixwazim gotina xwe bi dawî bînim.

Dibêje:

"Helbestvan tev dîl û bindestên kêş û rêzbendan in; tenê Melayê Cizîrî, kêş û rêzbend dîl û bindestên wî ne."

DILDAR ŞEKO







● 28.8.1995

Nûçevanê rojnameya Yenî Politikayê Sayfettin Tepe hate qetilkirin. Sayfettin Tepe roja 22'yê Gelawêjê ji aliyê polîsan ve li Batmanê ji buroya rojnameyê hate binçavkirin. Piştê ew birin Bilîsê, roja 28'ê gelawêjê di qereqola leşkeriyê de hate kuştin. Berpîrsê dewletê îdia kirin ku wî întixar kirîye. Lê xuya bû ku ew bi destên hêzên dewletê hate kuştin. Sayfettin Tepe berê di rojnameya Özgür Ülkeyê de jî nûçevanî kiribû.

● 19.8.1980 Di girtîgeha Amedê de rojnameyek bi navê "Hewar" li ser pêşniyaza Mazlum Doğan hatiye derxistin. Ji bo ku

rojname derkeve wezîfe dane Ferhat Kutay, wî jî logo û pîvanên rojnameyê tespît kirine û ji xwe re nûçevan ji qawîşên din tespît kirine. Wan agahî dema ku malbatên wan bihatana serlêdana wan digirtin û li ser agahiya şîrovevên teorîk dikirin. Nivîskarê rojnameyê Mazlum Doğan, Hayri Durmuş û Ferhat Kutay bûne. Rojname bi tirkî û kurdî derketiye. Nivîsên teorîk, siyasî, hunerî, edebî, çîneyîyê û çîrokên kurdî hatine nivîsandin. Rojname li ser kaxîzên defteran û bi destnivîsê hatiye nivîsandin, bi piranî nivîsên kurdî ji aliyê Ferhat Kutay ve hatine nivîsandin. Ev rojname li Almanyayê jî hatiye çapkirin.

AWIR

# Jibîrkirin xiyanet e

**C** arinan ji bo ku em neêşin kesên ku ji kîsê me çûyî em gelekî kêmtin bîra xwe. Belê heger ku ev êş ji bo tiştekî hêja be, ev jî me bi jiyane ve girê dide. Ji bo ayandeyê hîn çaktir û welatekî azad berê me dide têkoşinê. Ji bo jîndarkirina keç û kurên me, heval û birayên me rêka herî çak jî her ev e. Gava ku me ew jî bîr kirin, aha ewê hingê di nav tarîstaniyê de bimînin, ji ber ku em dev ji wan berdidin.

Me li dû hev gelek jiyane ciwan dane der. Li dû Hafîz Ferhat, li dû Ferhat Aysel, li dû Aysel Nazim, li dû Nazim jî Safyettin.

Berî sê salan ronîya çavên me, birayê me Ferhat bi awayekî herî dirindane revandin û ew kuştin. Jiyana bêyî wî bi me pir zor tê. Lê ji bo jiyaneke bîrmet bîranînê me yê herî ciwan hene. Li hemberî her zordariyê, di delîvên herî berteng de, bîranîna wî ya ciwan û hebûna wî, hêza berxwedan û xwera-girtinê da me. Li hêza me hêz, li cesareta me cesaret zêde kir. Aliyekî me êdî her tim Ferhat e.

Piştî kuştina Ferhat bi du salan, dîsa ji aliyê wan dirindeyan ve, canekî me yî dîtir hate kuştin. Bi wê kerba mezin a ku bi kuştina Ferhat negihîştine armancên xwe, vê carê jî Safyettin bi îşkenceyê kuştin. Safyettin destûr neda ku qelama Ferhat li erdê bimîne û ji cihê ku lê mabû dest bi nivîsînê kiribû. Centeyê wî li piştê, di dest de wênekê-şa wî, berê xwe da wan bajar û gundên ku Ferhat dixwest her bibîne. Çû, wêne girtin û kirin belgenamê.

Ew ne bi tenê bû. Êdî di bedenekî de du can bû. Êdî Safyettin û Ferhat bû. Gava ku di îşkenceyê de tifi rûyê mirovkujan kir jî du însan bû. Wekî ku nekarîna Ferhat bê ser û şûn bikin, nekarîna wî jî bê ser û şûn bikin. Bîlakîs hejmarê zêde kirin. Xortên dîtir ew tevî xwe kirin. Ew tevî xwe kirin û ew digel xwe birin lûtkeya (zîrve) çiyayên payebilind.

Pîrskirina, ma di jiyaneke nozde salane de mirov dikare çî bike, pîrseke diltezîna e. Bersiv, her di hundirê wê pîrsê de veşartî ye. Jiyana hinek kesan mîna firîna pinpinîkan e. Bi şikandina qalîkên xwe digihêjin azadiya xwe û li ser baskên xwe, her dem biharê hildigirin. Jiyana wan mîna pinpinîkekê pak û parzîrandî ye.

Em çar bira ne. Vatîniya cudayîya biratiyê, tevger û jiyane bi me da nas-kirin. Em êdî baş dizanin ku ne tenanet girêdaneke siruştî, ne jî bes tîkiliyên



binemalî ne. Digel ku niha em dûrî hev in jî, lê bi rastî em kêmtin caran ewqas nêzîkî hev bûbûn. Ewên ku Ferhat û Safyettin kuştine bila vê yekê baş zanîbin, ewê nikaribin vê sistema ku gencên me heder dike li ser piyan rabigirin. Her jiyaneke genc ku bi destên wan hatiye kuştin, dawîya wan û ya sistema ku wan xwedî dike nêzîktir dike. Ferhat û Safyettin tevî hevalên xwe, di jîndariya xwe de jî, di şehîdbûna xwe de jî bersiva herî çak dane wan.

Êdî pêdiviya veşartina kirinê xwe yê dirindane jî nabînin. Her kes dizane ku Safyettin di bin çav de bi îşkenceyê kuştin û her kes dizane yê ku ew kuştin kî ne. Em vê yekê li her derê bi eşkereyî dibêjin. Temet ku neyê veşartin eşkerebûna rûdanê û gilîkirina li Dageha Mafên Mirovan a Ewrûpayê, wan tengav dike. Ji ber vê yekê jî çav-soriyan li malbatên wan dikin. Bi hinceta "emê îfadeya we bigrin", dixwazîna îfadeya malbatê bidin guhertin û nehêlin ku li dûv doza xwe biçin. Daxwaza wan şelokirina îfadeya binemalê ya bi rengê "kurê me di bin çav de hate kuştin" e. Ji ber ku ew dibêjin, "wî xwe kuştîye" dixwazîna vê îdiaya xwe ya bêbingeh li şûna îfadeya wan bidin pejirandin. Lê belê ew rûdan tev, û tiştên ku ew dixwazîna bikin di cih de jî raya giştî û ji Dageha Mafên Mirovan a Ewrûpayê re tê ragihandin. Daxwaza me ne girtina qatîlên wan e. Her kes dizane ku kê ew kuştine. Daxwaza me li hemberî wan kirinê wan em bêdeng nemînin, da ku her kes guhdar û hişyar be û eşkerekirina rûyê cenga gemarî ye.

Ji Ferhat û Safyettin re soza me heyê. Emê bîr û baweriyên wan heta dawiyê berdewam bikin. Li her derê bi kerb û kîn emê bajon ser qatîlên wan. MIKRÎME TEPE

# ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



## Dîplomasiya nûjen hêza xwe ji têkoşîna gel distîne

**H** erger îro li welatekî wekî Ewrûpayê dewletek ne zimanê neteweyekê yê komekê qedexe bikira, ji bo demekê nehiştî ku kesek bi zimanê xwe bipeyive, bixwîne û binivîsîne, dê qiyamet rabûya; Ewrûpa li bin guhê hevdu biketa. Bi rojan û hefteyan rojname, kovar, radyo, televîzyonan wê di nûçeyên xwe yê yekemîn de ev bûyera hovîtiyê bidana; wê civîn, konferans, meş û xwepêşandanên girsî li dar bixistana; hikûmet û wezîr bicivîyan û mesaj bidana. Li ser navê mafên mirovan û demokrasiyê tofan û babelîsk rakirana. Lê belê, dema 40 milyon kurd dibin mijarê vê bûyerê, deng ji ewrûpiyan dernakeve. Xwe ker û lal dikin, bêdeng dimînin.

Ev yek di bûyera girtina televîzyona MED'ê de baş zelal û diyar bû. Dewleta dagirker a tirk ji bo girtina MED'ê hemû derfetên xwe yê diplomasiyê bi kar anîn. Dewletên Ewrûpayê ji bo berjewendiyên xwe yê neteweyî stûyên xwe ji daxwazên nijadperestên dewleta tirk re xwar kirin. Mafên mirovî û demokrasiyê jî bîr kirin. Ji daxwazên dewleta tirk a nijadperest re "okey" gotin û bi yek alî peymanê MED-TV xera kirin. Ev "okeybûn" bi awayekî fermî pejirandina qedexebûna ziman û edebiyata gelê kurd a kevnare ya hezar salan bû. Dewletên ewrûpî ji bo berjewendiyên xwe yê madî bûn hevkarên dewleta Tirkiyeyê ya nijadperest û şoven.

Wekî tê zanîn, bîngeha demokrasiya dewletên ewrûpiyan li ser berjewendiyên neteweyî hatiye avêtin. Ew li ser vê bîngeh û armancê li demokrasiyê û mafên mirovan dinêrin. Navê berjewendiyên xwe danîne "demokrasiyê" û "mafên mirovahiyê."

Bûyera MED-TV di vî warî de mînakê herî berbiçav e. Hemû dewlet, dem û dezgeh û kesên ewrûpî baş dizanin ku li parçeyê Kurdistanê ya ku di bin dest û bandora Tirkiyeyê de ye, ziman, wêje û çanda kurdî qedexe ye. Li ser gelê kurd û Kurdistanê zordarî û çewsandineke giran û dijwar heyê. Li Tirkiyeyê bombe dikin bin avahiyên rojnameyên kurdan. Rojnamevanan nava rojê li ber çavên her kesî digirin, dibin û wînda dikin, di girtîgehan de dikujin. Partiyên ku bi qanûnî hatine damezirandin, digirin. Parlementerên ku ji aliyê gelê kurd ve hatine hilbijartin, ji parlamentoya xwe derdixin û digirin davêjin girtîgehan û her yekî jî wan 10-15 salan cezayên giran didin ser piştê wan.

Bi rastî li Ewrûpayê mirovahî, mafên mirovahiyê, norm û prensîbên demokrasiyê bi pênc pereyan e. Ezezî bi ser her nîrx û rûmetî ve ye. Em berjewendiyên şîrket û monopolên mezin bidine aliyekî din, berjewendiyên wan ên ferdî û şexsî jî bo wan hêjayî şerefa mirovî û demokrasiyê ye. Ji kesê ewrûpî re ne tiştê e ku demokrasiyê û mafên mirov û neteweyan li Amerîkaya Latîn, Asya, Afrîka, Rohilata Navîn û li Kurdistanê ketibe bin lingên dagirker, diktator, kedxwar û xwînmijan. Ew difikirin ka çêja (tahma) kebaba tirkan çiqas xweş e. Tav û ava Marmaris û Antalya'yê çendî germ û nerm e. Bila ew hefteyekê li Antalya û Marmarisê biçin, dixwazî Kurdistan ji binî bê şewitandin û gelê kurd ji navê bê rakirin. Kultura 5 hezar salan qedexe dibe, ji navê wînda dibe, ji wî/wê re çî?! Ne dara wan dişewite, ne jî çûk û lawirên wan di navê de biçin! Ji bo gelê kurd, ev rewş ne rewş û helwesteke nû ye. Rewş û helwesteke dîrokî ye. Parçebûna Kurdistanê li ser vê bîngeh û armanca ewrûpiyan, bi taybetî ya îngilîz û fransîyan pêk hatiye. Lê, em kurd dilpak in û bûyerên dîrokî zû ji bîr dikin; tîkîstîk û planên biyanan. Piştê xwe bi wan listik û planên "demokrasiyê" ve girê didin. Bawerîya xwe bi xwe û hêza xwe nayînin. Ji xwe tevîli û taybetiya bizava rizgarîxwaza neteweyî ya nûjen û yê berê jî yek jê ev e. Ji ber vê yekê ye ku li Bakur bizava rizgariya neteweyî roj bi roj bi ser dikeve û bi pêş ve diçe. Wê hêviya xwe bi demokrasiyê piştigiriya ewrûpiyan girê nedaye û nade. Hêviya wê gelê kurd bi xwe ye. Hêza xwe ji rêxistinîya gelê xwe digire. Êdî ewrûpî jî baş bi vê yekê hesiyane û ji ber vê yekê mecbûr dimînin bi paş ve gav diavêjin. Ev jî ne ji demokratbûna wan tê, ji têkoşîna gelê kurd a bêtavîz tê. Kurd nû nû di platform û qada navneteweyî de, politîka û diplomasiyê hîn dibin û dimeşînin.





Hunermend Seîd Yûsiv û nimînendeyê me yê Sûriyeyê Helîm Yûsiv

# 'Rêxistinên kurdan li hunerê xwedî dernakevin'

**S**eîd Yûsif, navekî dîrokî ye di huner û muzîka kurdî de. Bêhtirî sî salî ye ku ev hunermend di warê muzîk û strana kurdî de dixebite û hetanî vê gavê behemên wî yên xweş, girîng û zelal belav dibin, gelek ji stranên wî bûne parçeyek ji folklor û wijdanê kurdî.

Awaz û stranên wî li ser her zimanî ne, mirov çiqas bibêje... hindik e, lê tu kes nikare behetî nemîne û hurmet û rûmetê nede "Bavê Zoro" gava ku tiliyên wî yên sivik, barana kêf û şahî û şî-nê ji tîlên tembûrê dibarîne û keriyên pinpinîkên evîne di dilê bihara Kurdistanê de difirîne.

Li Qamişlo, li mala wî, Seîd Yûsif arşîva xwe ji rojnameya Azadiya Welat re vekir, ku ji piştî sala 1967'an li Lubnanê hetanî niha çî şevbuhêrk û şevên di wan de beşdar bûye, li her deverên dinyayê her cihê ku kurd lê hene û na-

**Hunermend, şahidê dema xwe ye, ew çav e, dev e, guh e, pejn û hîsa gelê xwe ye. Li her derê cîhanê rastiyeke heye ku tê pejrandin, her kes nikare bibe hunermend. Ji lew re hunermendîti hem jor e û hem jî berpirsiyeke mezin li ser milê wî/wê ye. Nimînendeyê me yê Sûriyeyê HELÎM YÛSIV bi hunermendê navdar Seîd Yûsif re ev hevpeyvîn pêk anî.**

vên wekî M.Arîf Cizrawî, Tehsîn Taha, Îsa Berwarî... di arşîva wî de berçav in. Digel arşîveke taybetî ji dînan re, dînen Qamişlo, wênayên wan jî di arşîva hunermendê mezin de cih digirtin, lê wî ne tenê arşîva xwe, belê dilê xwe jî ji me re vekir di vê hevpeyvîna jêrîn de.

\*\*\*

*Saz û awazên we, hunera we gihîştîye her kesî, lê gelek ji xelkên me û ji xwendevanên Azadiya Welat jiyana we xweşik nas nakin; Seîd Yûsif kî ye?*

● Li Qamişlo, li Bişêriyê sala 1948'an ez hatime dinyayê, bavê min ji

Êla Reman bû, piştî kuştina Seîd Osman kalikê min, bavê min Üsiv daket binxetê û li Qamişloyê bi cih bû.

Di sala 1965'an de ez fêrî tembûrê bûm. Ji ber ku şevbuhêrk û stranên kurdî li vir qedexê bûn, min sala 1967'an berê xwe da Beyrûdê; di Radyoya Lubnanê de min kar kir. Çend sêlik û kaset tomar kirin, pişt re ez vegeyriyam Qamişloyê. Min çend kaset diyarî Radyoya kurdî li Bexdayê kirin û min berê xwe da Bexdayê; çend parçe ji muzîkê tomar kirin. Di 1971'ê de min mala xwe bir Beyrûdê, li wir grubeke folklo-

rê mezin min damezirand bi navê Civate Newroz, di 1973'yan de. Yûnisko ez dawetî çend konseran kirim li Bonn û Berlinê di 1974'an de; grubeke muzîke li Lubnanê ez dawetî çend dewletên Afrîkî kirim (Nijerya, Sahililac..).

Li wir me çend şevên muzîka rojhatî li dar xistin. Di 1976'an de dema şerê sivilî li Lubnanê dest pê kir, ez vegeyriyam Şamê û di Radyoya Şamê de ez xebitîm.

Piştî salekê min berê xwe da Helebê û min firoşgeheke kasetan vekir, di 1979'an de ez vegeyriyam Qamişloyê û ji 1987'an heta niha ez berê xwe carekê didim Ewrûpayê û vedigerim.

*Hûn û tembûr mîna cêwîyan in, nayê bîra min ku hûn ji hev qut bûne, ev tîkiliya dîrokî di navbera we û tembûrê de çî raz bi dû de ye? Tîkiliyên we bi tu aletên din re hene, ji bilî tembûrê? Kê*



ji we yê din hilbijart?

● Mirov aletê hildibijêre, muzîk xwarina can e, ez ji muzîkê bi giştî hez dikim, çî dengê saz û mewzûn were min, kêfa min tê; bila ji kîjan aletê be, lê pişka min li tembûrê ket. Çimkî ev aleteke kurmancî ye û ez li hemû aletên din dixînim, lê bi taybetî tîkiliyên min bi tembûrê re ne. Tembûr siya min e, bêyî wê ez nikarim bimesim, bêyî wê ez xwe kêr dibînim.

Akamên dengên tembûrê xwe ber didin damarên min, nemaze ku tembûrê reke birêkûpêk be ez kesîtiya xwe tê de dibînim, dibe ji ber ku aleteke rojhilatî ye û ketiye xwîna civaka kurdî, tembûr zimanê mirovê berve dê e ku hestên mirov û jana dilê wî dide xuyakirin.

*Hûn bêhtir xwe awazvan dibînin an dengbêj; xuya ye ku awazên we balkêştir in ji deng, nemaze awazên sivik û kin, gelek ji stranên we bûne folklor. Pêwendiyên awaz û gotinan li cem we bi çi rengî ava dibin?*

● Tiştêkî normal e çendî hunermend dengxweş be û sazband be; dûmahiyê her saz dimîne, lê deng rojek wê bê ku xera bibe, ji ber ku mezîna dibe. Lê muzîk baştir û xweştir dibe û bêhtir bi pêş ve diçe. Ev cihê serbilindiyê ye ku ez awazvan bim û ez xwe awazvan dibînim berî her tiştî, ji ber ku berhemên min pir in. Awazên min bi sedan hene, yê amadekirî û nehatine belavkirin.

Baweriya min bi min heye ku ez di-



karim hemû hawa û textlîten helbestan awaz bikim, ez dibînim ku ez dikarim bersiva demê bi awazan bidim. Her demek taybetiyeke wê heye. Miletê me ji ber ku tu zankoyên (unîversîteyên) kurdî venebûne û xwendin bi firehî çênebûye ta ku bikaribin helbestên Xanîyan Cizîrî yan Cegerxwîn tê bigihêjin. A baş ew e ku mirov karibe helbestekê bi şeweyekî hesanî çêbike ku karibe ji xwe re bibêje û hetanî zarok jî jê fêhm bikin û bibêjin.

Gava ku gotinên helbestê bi hesanî bîn nivîsandin û bi rehetî bîn fêmkirin û awazeke sivik û li gorî wê helbestê bê danîn, bêguman, wê ew helbest zû belav bibe û cihekî girîng ji xwe re bigire.

Eger helbestekê, zarokan ew ji devê hev revandin, zanibe ku ew helbest serketî ye.

*Gelek hunermendan stranên we strandin, hinek ji wan jî bê destûra we,*

*hûn ji vê yekê razî ne? Li hember vê yekê we jî ji hinek hunermendên kevîrandin, hûn ve rewşê (di strana kurdî de) çawa dibînin?*

● Ez bi xwe kêfxweş dibim, dema ku ez bibînim dengbêjên mezin stranên min dibêjin, çî bi destûr, çî bê destûr. Lê wê xweştir bûya eger bi destûra min bûya. Rexneyên min jî li ser hinekan ji vanên ku stranên min dibêjin hene, wekî Şivan, Rezazî, M. Şêxo, ku stran dibêjin, carinan helbestê xera dikin û ya dirust nabêjin. Bila stranên min bibêjin, lê ez bi hêvî me ku xera nekin, tiştêkî normal e, eger wekî ku ez dibêjim ew jî bibêjin.

Ez gelekî ji folklorê hez dikim û ez stranên tu kesî nabêjim, eger ne folklor be. Eysana Elî, ne ya Mihemed Arîf Cezrawî tenê ye. Ez xwe serfiraz dibînim gava ku ez folklorê distrêm ji ber ku ev folklor tune bûya wê ev stran û helbest jî tune bûna.

*Tunebûna awazvaniya kurdî yê mîna Sunbatî, Qesebçî û Belîx Hemdiyê li cem misriyan çî sedem bi dû de ye? Geleto pêwîst e ku awazvan dengbêj be jî; li cem me kurdan çima rewş wisan e?*

● Tunebûna awazvanên kurd girêdayî ye bi rewşa me ya siyasî ve; dewlet tune ye, radyo û televîzyon tune ne, mafên muzîkvanan wîna ne, dibe ku gelek dengbêj stranên ji min dixwazin, ez nikarim awazên xwe wisa bi wan bidim bêyî ku tiştêkî li hemberî wê danê hebe.

**R**exneyên min jî li ser hinekan ji vanên ku stranên min dibêjin hene, wekî Şivan, Rezazî, M. Şêxo, ku stran dibêjin, carinan helbestê xera dikin û ya dirust nabêjin. Bila stranên min bibêjin, lê ez bi hêvî me ku xera nekin.

Bi rastî tunebûna awazvanan nexweşiyêke pir mezîna e. Mixabin kurd li dorê 35 milyonî ne û deh awazvan di nav wan de tune ne, li cem gelên din awazvan dikare bi sazkirina awazên xwe tenê bijî, lê li cem me ne wisa ye, xwediyê awazan eger kurd be li gema nanê zarokên xwe diheyire û dengbêj pir bûne, dizî pir bûye.

Berî demekê di 1'ê meha 8'an a 1996'an de di Dengê Amerika, Beşa Kurdî de, Husên Hovik (şevger) digot ku 560 helbest û stranên wî hene, gelek dengbêj bi vî rengî xwe didin nasîn, lê ya rast ew e ku, ji bilî jinên wan tu kes bi wan nehesiye.

*Gelek dengên kurdî biçûk û nûhatî wê hebin, jixwe hûn zanin ku giha şîna nabe bêyî erdekî xweş. Di baweriya min de, hûn yek ji xwediyên vî erdê xweş in, di strana kurdî de; çima hûn re venakin li ber van dangan?*

● Mirov ne amade ye ku çî dengên

xweş xuya bikin li meydana ez herim alîkariya wan bikim. Na, dibêjin, eger delalê malê yek bûya minê bi şîr û şekir xwedî kiribûya, lê ew kesê ku bixwaze bi pêş ve here û bibe dengbêj û baweriya wî bi min û hunera min hebe, dikare bê cem min. Lê ku ez bidim û nestînim, Xwedê wilo negotiye û eger ez alîkariya yekî bikim û ew jî min gencîne ji xwe re bibîne. Ev nayê pejirandin. Lê dema ku di rîya welatparêzî û rîyeke rast de be, xem nake. Lê xelkên me nîrxê hunermendan nizanin û nagirin.

Berî demekê, piştî ez ji Ewropayê vegeyriyam mirovekî ji xwe razî numareya telefona min xwest, min got:

"Çima?"

Bersiva wî ev bû:

"Carinan tu bi şev ji me re gerek dibî."

Ev mînak neynikek bû ji mejiyê gelek kesan re, mîna keke balkêş heye ez dixwazim bibêjim, ku di 14'ê pûşpera 1996'an de, roja derbasbûna 39 salan di ser damezrandina partiyê di Sûriyeyê de. Hemî Derwêş, li ser gora Cegerxwîn diyariyeke sembolî dabû me, ji vê mînakê kêr hene û çênabin ji ber ku piştgirên hunermendan di nav me de kêr in an jî tune ne. Hunermend bi tena xwe rê vedike.

*Berî demekê "Govenda Dilan" hati-bû çapkirin, ev jî helbestên stranên we ne û bi tevayî we nivîsandibûn, çî tîkîlî di navbera we û helbestan de hene û çî-*



*ma we helbestên tu kesî nekirin stran?*

● Baweriyeke min heye, çawa ez di awazên xwe de serketî me, divê helbesta min jî wisa be, wekî ku ez dixwazim, ne kesekî din.

Tu car û tu car helbestvanekî bêgane nikare umîda dilê dengbêj bike helbest û çêke, hîç çênabe. Ez dikarim helbestan çêkim, ezê çêkim, gelekî hurmeta min heye ji gelek helbestvanan re, hinek helbest hene hêjne ku ez awazan jê re çêkim, dibe û di pêşerojê de ev tişt bibe.

*Hûn rewşa muzîka kurdî, hunera kurdî, di vê demê de çawa dibînin, li vir û li deverên din û eger mirov Seid Yûsif ji meydana ve hunerê bide alî, wê çî jê bimîne?*

● Muzîk di nav kurdan de bi tevayî hem kêr e û hem qels e. Ango li gorî hejmara kurdan a mezîna hejmara hunermendan gelekî kêr e, ji ber ku meydana vala ye, ez dibêjim eger tu min bidî alî wê akameke (tesîr) mezîna bibe,

ev rewşa kurdan e li her deverê welêt, hem muzîkvan kêr in, hem muzîk bi pêş ve neçûye û sedemên wê rewşê pir in. Ne dewlet û ne propaganda û ne guhlêdan...

A niha eger Kurdistan bi her çar parçeyan bibe yek, kurd di vê demê de nikarin komeke simfonyê çêkin, ev rastiyek e, ji ber ku ew endamên ku dikarin vî karî bikin kêr in an jî bela wel ne û nagihên ser hev.

*Ne welatê kurdan tenê, belê muzîk, awaz û stranên wan jî hatine dizîn, dûmahiyên bav û kalan, axîn û êş û derdên wan tevde tar û mar bûne, bêyî ku şerm bikin, hinek dengbêj bi zimanê biyanî taybetiya muzîka me dane ber talanê û dixwazin serê rastiye bi zimankî din jêkin?*

● Eger dewleta me hebûya û mafê çapê parastî bûya, ev dizî, bi vî rengî nedibû, muzîk û strana kurdî destpêk bû, xweser derdiket, wan jî evên biyanî birin û xistine reşgekî dim. Her aletek rola xwe dilîze, wan bêhtir mafê stranê didayê, lê bîngeha stranên kurdî ye.

Mînak, muzîka tirkî ji sedî panzdeh ji muzîka kurdî hatiye girtin. Ez dikarim navê çendan bibêjim ku bi tirkî awaz û stranên me gotine: Nuri Sesigüzel, İbrahim Tatlıses, İzzet Altınmeşe, Burhan Çaçan, Ahmet Kaya, Belkıs Akkale û ji bilî van bi sedan henc ku stranên kurdî dizîne. Tu kes nikare stranê biparêze eger dewlet tune be.

Mixabin rêxistinên kurdî tiştêkî na-

**M**uzîka tirkî ji sedî panzdeh ji muzîka kurdî hatiye girtin. Ez dikarim navê çendan bibêjim ku awaz û stranên me gotine: Nuri Sesigüzel, İbrahim Tatlıses, İzzet Altınmeşe, Burhan Çaçan... Tu kes nikare stranê biparêze ku dewlet tune be.

kin û haya wan ji me û ji muzîk û hunerê tune ye, ma kîjan tirk heye ku Keçvokê, Çeçanê, Xeydokê negotiye, tevî ku dizên awaz û stranên kurdî pir in jî, lê mixabin tu rêxistinên kurdî doza mafê me nekirine, bi xurtayî û tu tiştî ji huner û toreyê re nakin.

*Pirsa dawî, dînbûn û huner, di arşîva we de wêneyên gelek dînan hene, hûn û dîn çî ji hev re dibêjin?*

● Dibêjin huner dînbûn e, ev rastî ye, ez ji dînan hez dikim; ji ber ku dîn dema ji mirov hez dikin, hezkirina wan eşkere ye. Rojekê li tabloyeke Pîkaso binêre yan li wêneyê wî, wekî dînan e. Hunermend mîna dînekî xuya dike, çimkî dîn bi dilekî paqij ji mirov hez dike û mirov tu carî naxapîne.

Carekê yekî dîn hat cem min û tîlek di destê wî de bû, ji min re digot:

"Min tîlek kiriye, lê tembûrekê ji min re divê, ka tembûrekê?" Ez ji dan û standina bi dînan re pir hez dikim.



# Ji Başûrê Biçûk çend helbest

**RIFÊT ŞÊXO:** Di sala 1969'an de li bajarê Helebê hatiye dinyayê. Dîwana xwe ya yekemîn di sala 1995'an de li Şamê da çapê. Ew dîwan bi zimanê erebî ye.

Em du helbestên wî ji we re pêşkêş dikin.

## Bi dizî

Birîn silavên tazî  
vedixwe û buha dibe.  
Lêvên bezê ziwa bûn.  
Ziman bû  
paçekî qulkirî  
Çemekî ji mêşan  
Rijandin ser siya min  
Ya şêrîn û sînor vêkefî  
Xwînek zingarî  
Ji zengilekî bêkêr dişemite  
Bajar tevde  
Dibe melhemeke mirî  
û...  
mişk dilan hildiweşînin

## Mistek ramûsan

Mistek ramûsan  
Di bêrika min de ziwa bû

Bêhna min pirek e  
Tirsê ji xwe dadiweşîne.

Lêva min ya jor  
xwişka xwe ya jêr  
winda kir.

Lê..  
Devekî biçûk  
li ser devê min tê nivîsandin

Di gewriya sgiriyê tenahiyê de  
memikên te seriyên xwe derdixin  
Û...  
dibişkivin  
Êşeke nerm difire.  
Mistek ramûsan  
di bêrika min de ziwa bû  
Ew nehat.  
Siya min ji min enirî  
û navê min ji xwe  
dot..

\*\*\*\*\*

**GULÊ ŞÊRÎN:** Di sala 1974'an de li Qamişlo hatiye dinyayê.

## Soza dil

(1)  
Carekê şiyar bû,  
carekê razayî bû

Di her du caran de  
yek raman bû  
yek xewn bû  
yek kes bû  
yek nivîsok bû  
lê pirtûka wî tune bû.

(2)  
Ji îro pê ve

ezê dîrî hemû kesî bikevim  
û nêzikî te tenê bibim  
û te hembêz bikim  
Rojên çuyî tev li şîna wan  
û kêfxweşiya wan,  
ji bîr bikim.

Nema mijûl dibim di rojên bên de  
Bes ezê li hêviya hatina te bim

Ji bo te hembêz bikim bi germahiyê  
gulên li hemû deveran deynim  
dûrî çavên xelkê  
dûrî zikreşiya evîndaran  
tev li muzîka ku ji nava min  
derdikeve.  
û lêvên min dibêjin  
ezê ji te tenê re bim.

\*\*\*\*\*

**JANA:** Ji Başûrê Biçûk e, di sala 1976'an de li Amûdê ji dayik bûye. Ew niha li Helebê dijî.

## Lehî

Dilê min  
Şeveke tarî bû.  
Stêrkên wê  
tev  
vemiribûn..  
Tîrêjên berbangê  
wekî  
lehiyeke xurt  
şev  
dan pêş xwe.

Evîna te ji  
bi  
xwe re  
bir.

\*\*\*\*\*

**CÎHAN BÎLAL:** Ji Başûrê biçûk e, li Efrînê di sala 1974'an de ji dayik bûye, li fakulteya edebiyatê dixwîne.

## Dîlana di kirasê azadiyê de

Rojekê  
Dijminê min got:  
Hûn tu carî nagihin mafên xwe.  
Min jê re got:  
Dema em bi hev re  
bimrin  
û ruhê me  
bigihin ezman  
ezê li te  
bigerim  
û bi destê  
te  
bigirim  
ta di  
pencereya  
vekirî de  
welatê xwe  
nîşanî te bikim  
di kirasê azadiyê de  
dilanê dike.





**ÇALAKIYÊN vê heftiyê li navendên çandeyî:**  
 Li NÇM'a Stenbolê  
 ● 25.8.1996 **Yekşem:** Konser "Türkü çalı jazz", saet 18:30  
 Metin Kahraman û hevalên wî.  
 ● 30.8.1996 **În:** Hunerên dîtarî, Film: "Kaldırım çocukları (zarokên peyarêyan)", rejîsor: Vittorio de Sica, saet 19:00  
 ● 31.8.1996 **Şemf**  
 Konsera Ozan Delîl, saet 18:30  
 Li NÇM'a İzmirê 30.08.1996 **În:** Semîner, Cezmî Ersöz, saet 17:00  
 "Doğadan kopuş ve yabancılaşma" (Biyabûn û dûrketina ji xweza-

yyê) Konsera komanê, saet:19.00. Hüseyn Dinler, Cem Dinler.  
 Li Evrensel Kültür Merkezi:  
 ● 28.8.1996 **Çarşem:** Film, "Ağustosta Rapsodi", derhêner, A. Krosova, saet 18:00  
 ● 29.8.1996 **Pêncşem:** Film, "Düşler", derhêner, A.Krosova, saet, 18:00.  
 Li Tohum Kültür Merkezi:  
 23.8.1996 **Şemf:** Film, "Sürü (Kerf)" saet 15:00  
 ● 24.8.1996 **Yekşem**  
 Semîner, "Faşizm üzerine", saet 14:00

RÛDAN

Di warê muzîkê de navekî nû...  
**Koma Agirê Zerdeşt**



**Di warê muzîkê de em dixwazin ji bo do û sibe bibine pir. Daxwaza me ew e ku em xwe bigihînin yên ku li dengbêjan guhdariyê dikin û yên tiştînan modern jî guhdarî dikin.**

**D**i nav şaxa îzmîrê ya NÇM'ê de bi navê "Koma Agirê Zerdeşt" komeke muzîkê dest bi xebatê kir. Heta niha li şaxa îzmîrê ya NÇM'ê komek muzîkê tune bûn. Koma Agirê Zerdeşt ji pênc kesan pêk hatiye. Ev du meh in ku Koma Agirê Zerdeşt di nav NÇM'ê de dest bi xebatê kiriye. Heta niha li îzmîrê du konser û li bajarê Stenbolê jî konserek dane. Li ser sazûna komê endamên komê "Bi rastî avakirina koman ne hêsan e, ji ber ku di warê hunerê de her insan dikare bi çavekî din li berhevan nêzîkahî bike û binirxîne. Xebata bi serê xwe tiştek e, ya di nav komê de tiştekî din e. Lazim e zêdetir kom bîn avakirin. Tevî zehmetiyên pêwistî jî hene, me ev kom ji ber pêwistiyan ava kir" dibêjin. Endamên Koma Agirê Zerdeşt dibêjin, ne şert e ku her hunermendek di nav komekê de çih bigire, kom girîng in lê ev kesên ku di warê hunerê de xurt bin û bixwazin xebata xwe tenê bidine meşandin, divê rê li pêşiya wan vekirî be. Û li gotina xwe zêde dikin: "Em îro pênc kes in, lê ev nayê wê maneyê ku heta bi hetayê emê pênc kes bimînin. Dibe ku hejmara me zêde jî bibe û dibe ku kêr jî bibe. Di xebata hunermendiyê de fikrên ji hev cuda jî derdikevin. Di şertên îro de em giraniya xwe didin ser xebata bi hev re, em pêşveçûnê di xebata komê, xebata kolektîf de dibînin. Lê em dixwazin ku

kesên mîna Aram, mîna Şivan, mîna Ciwan Haco hîn zêdetir bibin. Lê ew kesên ku xwe dengxweş bihesibînin û dixwazin li saza xwe bidin û bistrên, ew sarfiraz nabin. Yê ji hunerê fêmkirin, hunera wan xurt e, divê ew bikin..." Endamên komê, muzîka xwe, nêzîkahiya xwe û muzîkê jî bi van gotinan tînin ziman: "Di warê hunerê de, di warê muzîka kurdî de em dixwazin ji bo do û sibe bibine pir. Yanê daxwaza me ew e ku em xwe bigihînin yên ku dixwazin dengbêjan jî guhdarî bikin û yên ku dixwazin tiştînan modern jî guhdarî bikin. Rewşa gel em dixwazin ji her aliyê ve binin ziman; ji aliyê siyasî, ji aliyê aborî, ji aliyê civakî û evîndariyê ve... Emê stranên gel ji nû ve bi rengekî nûjen şîrove bikin." Gelo ji bo tomarkirina kasetekê tu xebata wan, haziriyeke wan heye? Na, dibêjin hêj zû ye. Û gotina xwe bi bersiva vê pirsê diqedînin: "Em komeke nû ne. Wekî her kom û her hunermendî em jî dixwazin kasetê çêbikin, lê em lez nakin, hêj zû ye. Em dixwazin berhemeke baş biafirînin. Hêj xwe bi temamî wekî hunermend nabînin. Stranên me hêj baş nehatine rûniştandin. Wê di demeke nêzîk de kêmasiyên me ji holê rabin û emê dest bi haziriyan bikin."

R. DILOVAN

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Konferansê YMK'î

**H**er çiqas ke dem tenê vêrdo ra jî, ez wazena Konferansê Yewtiya/ Jûtîyan Musnedaranên Kurdistanî (YMK) ser ro bivinderî. Konferans rojanê 22-23.06.1996 de amê kerdene. Nê konferansî de davistê musnedar, perwerdeker û kesê bîni hazir bî. Rojûnê der heqê karanê organize de derbaz bî, wendena raporê, weçîntena komîteya newiye ûêb. Nê roje jî karê YMK'yê taybetî ser ro amê vindetene. Bêguman dem şenik bî. La belê wunciya jî tenê tengasî, problemî amê qesekerdene û projeyanê newiya ser ro amê vindetene. Tengasiya girsêriye meseleya zarava/ zarave biye. Sebata ke wertê zaravanê zonê kirmancan de cudatiyê girsî estê. Kirmancî zaf raya jûbînî fam nêkenê, tengasiye vecîna. Bêguman na zaf normal a. Gelê zona de tengasiyê niyanênî biye, estê û benê. Tengasiya ke zonê kirmanca de esta, yan jî zarava ke wertê kirmanca de tengasiye vecena, kirmancî/ kirdkî, tayê vanê zazakî, yo. Ê bîni niyê. Naca de tengasiye tayîna bena interesant. Qeyî kirmancî de? Çimke verocoyî/ verde kesê ke gere kirmancî qese bikerê, qese nêkenê. Nê kesî teyna eke tenge de mendî, vanê: "Ez kirmancî yan jî zazakî zana, ez kirmancî/ kirdasî, soranî nêzana." Mordem ke cira vano: "Rind, de zarava xo qese bike." O dem jî dest keno prosesê asîmîlebiyena xo, dest keno tirkîyê "delalî". Tirkîyê "zonê ilm û çepitiye" ebi dê şekimeno. Dûmano siya ma mecêro! Serê de tirkî musenê, di serî de almanî yan jî îngilizî musenê, 30-40 sere de zonê xo nêmusenê. Ma probleme çika? Probleme diyena metodê çareserkerdena na tengasî ya. Bizano, mezano her kes, hama her kes angorê xo metodê de rind vînenê û wazeno ke her kes nê metodî bixebetno. Jûkek avêberdena jû zarave rind vînenê. O bîni hem avêberdana jû zarave hem jî tîmîyankerdena zaravan raşt vînenê. Jûyê de bîni avêşiyena zarava pêrîne raşt vînenê. Mordemê de bîni avêşiyena zarava pêrîne raşt vînenê û vano: "Hama gere falan zarave tayîna avê şoro." Kam se vano, vaco. Kes gamêde pratîke nêzereno. Yanê der heqê avêşiyen, hîra û xorî biyena zarava de (zafêrî jî kirmancî de) kes xo nêdajnenê. Ya tirkî, almanî, îngilizî rind zano, yan jî zaravêde bîne museno. Seba naye jî, angorê kesanê ke niya kenê, pêwîstiya avêberdana, hîrakerdena û qesekerdena zarava kirmancî nêmaneno. Eke ge ge mordemî na zarave arde vînrîn xirab niyo, nê amê jî qe problem niya. Jû ke rawurzo der heqê na zarave de kar bikerê, o kar jî zafêrî binê lînga de şono, beho vîndî, nêno diyene. Ez bawer kena na mesela huna sarê ma zaf dajnena. Çimke der heqê na meselê de zaf kesî, bêprensîp, bêzanayene û ebi verhukum (önyargî) qesekenê, qerar danê û çiyê de pratîk jî nêkenê. La belê çareserkerdena naye xebat, sebir û dem o. Gere xebatê de xurt bêro kerdene. Eke seba domananê kirmanca ke çiyê amê amadekerdene, gere der heqê zonî de, bêro redektekerdene. Redaksiyon gere zaf rind bo. Her zarave ra kesî tedê bê û zarava nêzdiyê jûbînî kerê. Seba naye jî gere; 1-Komkerdena materyalê ke na ware de amê viraştene; 2-Amadekerdena materyalê dersdayene seba musnedara/ mamostaya; 3-Koordînasyon û komunikasyon wertê pîspora û amadekerdena pirtûkanê perwerdekerdene; 4-Komkerden û analîzkerdena materyalanê didaktîk û metodîkî; 5-Koordînasyonê amadekerdena materyalanê niyadayen (visuel), goşdayene (audio), kasetanê video û vengî; 6-Amadekerdena pirtûkanê wêneya/ resma seba domananê vermekêbî; 7-Seba viraştene kilananê/lawikanê domana, karê huneriyê hetê hozan û muzikvana ra; 8-Avêberdena karê zelalakerdena zarava; 9-Têverşanîtena zarava; 10-Viraştene termînolojiyê de newe seba zarava pêrîne. Eke dem û sebir jî amê nê karî ser, tengasiye xelesîna. De hayde dest bierzîme nê



# Hêlîn bû teyrika nava refan

**Bi tenê Hêlîn cihê û cuda difikirî, wê dizanibû, welatê mirov bindest be, rûmet û şerefa mirov jî kêr e. Hêlînê dizanibû ku welatê mirov mêtîngêh be, jîyan li mirov heram e; gundê mirov jî wê bişewite, wê li keç û bûka mirov jî tecawûz bibe, mirov wê bîn kuştin jî. Her wiha mirovê lêdanê jî bixwe û koçber jî bibe.**

**H**êlîn keçeke malbateke kurd; xweha pênc birayan û sê xwehan bû, a herî biçûk û herî dawîn bû. Hêlîn, di mercên dijwar de jiya û bi ser lingan ket, êdî devê wê dikaribû çend hevok bigotana û di encama tevgerên di nava malê de dibe hindêk be jî, tê digihîşt.

Dayik û bavê ku ew anîne dinyayê, cudahî dixist navbera wê û birayên wê. Birayên wê karîbûn tişt ji diya xwe bixwestana, bigeriyana, bileyistana, lê Hêlînê nikaribû tiştêk ji dayik û bavê xwe bixwesta, bi serê xwe bigerîya. Wê çî bixwesta, bira, dayik û bavê wê digotin:

“Tu qîz î, mafê te tune.”

Hêlîn di nava vê nakokiyê de mezin bû. Her ku mezin bû, hê zêde tê gihîşt û xwe hê zêde nas kir. Bû qîzeke çardeh salî, derketina derve ji wê re qedexe bû, li pêş zilaman xwarina nan, rûniştina li hinda mêran qedexe bû, lê birayên wê azad bûn, li gorî wê azad bûn, dikaribûn li civatan biaxivin, bigerin û bikenin.

Hêlînê di dilê xwe de bi nependî navêk li vê jiyana jin û qîzên Kurdistanê kir, ‘koletiya bêrûmet’, bi gotineke din jiyaneke heywanî.

Lê nedizanibû ewê çawa ji vê jiyana rizgar bibe. Hêlîn hê di nava vê nakokiyê de bû, dengê şoreşê bihîst û di nava şoreşê de dengê qîza kurd. Hêlîn, dilşad bû.

Hêviyeke nezin bû roja Panzdehê Gelawêjê û di dilê wê de hilhat. Lê hê ev kêfa dilê Hêlînê dîvdîrêj nebûbû. Lehiya şoreşa kurd li erdnîgara ku Hêlîn lê diji belav bû û zilm û zora dijmin jî bi xwe re anî û mezin kir. Rojê gundekî cînar dihate şewitandin û gundî koçber dibûn.

Hêlîn metel mabû, giregirên zerîpoşan, firok û gerîdeyên leşkerî xewa şevan li Hêlînê herimandibûn û her diherimandin. Di berbanga sibehekê de li derî dan, Hêlîn bi hêrs ji xew çeng bû, lê bavê wê, diya wê û hemû xweh û birayên wê berî wê rabûbûn û şeperze bûbûn.

Hêlîn tê gihîşt ku ev ne tiştêkî xêrê ye. Lê kesê ku li derî didan bêaram bûn û qet dil tune bû ku dev ji lêdana derî berdîn.

Dayika Hêlînê bitirs destê xwe yê ku diricife dirêjî çirtika derî kir, bi vekirina derî re mîna conegayan bi gurîn ketin hundir. Birinc tevli sindikê, sindik

tevlî arvan, arvan tevli nîskan, rûn tevli dimsê kirin û bi dîv re ew bi pêhn û doxa G3’yan kutan û avêtin derve. Kesên ku li wan didan çiqas bi navê xwe û bi şexsê xwe bişibin însanan jî, mêjiyê wan ji yên heywanan hê wêdetir bûn.

Ewil hemû gundî li navenda gund kom kirin, paşê hinan ji wan dest bi şewitandina xaniyan û hilweşandina wan kir û hinan jî bi qundexa G3’yan dev û pozên gundiyan şikandin û ew kirin nîv kuştî. Bi vê yekê jî neman, jiyana gund li wan qedexe kirin û hemû bûn koçber.

Bav û dayika Hêlînê jî mîna hemû dayik û bavên ên malxirabûyî biryara çûyîna metropolên Tirkiyeyê girtin û tenê rahiştin çakêtên xwe yên tev bixwîn, berê xwe dan metropolan. Di gerîdeyê de jiyana Hêlînê, kêlî bi kêlî tiştên jiyabû careke din di hişê wê re derbas bûn:

Qîza kurd a kole, jiyana bindest, gundê şewitî û qîza azad a gerîla yek bi yek hatin hişê Hêlînê, demeke kurt mêjiyê wê dagir kirin û çûn.

Malbata wê li teniştê bajarê biyan çadireke çiriyayî vegirt û li binê çadîrê, her yekî/ê cihek dît û rûnişt. Her yek ji wan li cihê xwe diponijîn. Lê tiştê di mêjiyê wan de derbas dibû, bi giştî dişibî hev û din. Dilê wan dikir tep û rep difikirîn ka gelo ewê çawa li vî bajarê biyan ji xwe re kar bibînin; ewê çawa bijîn; ewê çawa di vê çadîrê da debar bikin.

Bi tenê Hêlîn cihê û cuda difikirî, wê dizanibû, welatê mirov bindest be, rûmet û şerefa mirov jî kêr e. Hêlînê dizanibû ku welatê mirov mêtîngêh be jîyan li mirov heram e; gundê mirov jî wê bişewite, wê li keç û bûka mirov jî tecawûz bibe, mirov wê bêne kuştin jî. Her wiha mirovê lêdanê jî bixwe û koçber jî bibe.

Hêlînê dizanibû ku ger çareseriyêkê ve pirsgirêkê hebe ew jî şer e, şoreş e û bi xurtbûn û mezinbûna tevgera azadiyê ye.

Bi vê tîgihîştinê rahişt Hêlînê û ew bir nava karwanê azadiyê û jiyana azad. Hêlîna bêhêlîn bû xwedî hêlîn.

Hêlîn bû şervan li ser singê çiyayên welêt, dest bi avakirina hêlîneke bêtirs, bêkuştin, bêpenaberî, bêkoçberî û bêtecewûz kir.

Hêlîn bû teyrika nava refên karwanê azadiyê.

BIRUSK ARJÎN





# Çîrokên jiyanêke bi aramî

Di çîrokên Sîma Semend de kana hemû xerabiyê nezanî ye. Li aliyê din pesndayînen ji bo sîstema sosyalîst mirovan difikirîne? Li hin deran çîrok diçe ser dirûvê çîrokên nivîskarên tirk ên di destpêka serdema komara tirk de. Di warê zimanê nivîskar de hin awayên gotinê û devok hatiye parastin.

Kurdên Yekîtiya Sovyetê ya berê, perwerdehî bi zimanê xwe dîtine, di warê geşkirina çanda xwe de hin gav avêtine û ji gelek cureyên wêjeyê berhem dane. Piştî hilweşina sîstema sovyetîk û gurbûna tevgera azadiyê ya kurd, têkiliyên di navbera kurdan de zêde bûn. Gelek pirtûkên ku li komarên sovyetê bi tîpên kirilî çap bûbûn, li tîpên latîni tîpên wergerandin û ji nû ve tîpên çapkirin.

Weşanxaneyê Nûdemê jî heta nîha çend pirtûkên nivîskarên kurdên Sovyetê çap kirin. Îcar wê weşanxaneyê pirtûkeke çîrokê ya Sîma Semend a bi navê Xezal ji nû ve çap kir. Ev pirtûk cara yekemîn di sala 1961'ê li Êrîvanê bi tîpên kirilî derketiye. Tîpguhêziya ji kirilî bi destê Şefîk Kaya çêbûye. Pirtûk ji sê kurteçîrokên pêk hatiye, du ji wan gelekî dirêj in, yek kurt e.

Di çîrokên de tiştê hevpar aramîbûna rewşa civakê ye, naveroka çî-

rokan bi piranî li ser evîna dil e. Bi taybetî di çîroka yekemîn ku navê xwe daye pirtûkê de, xweşbînî balê dikişîne. Xezal keçeke gelek baş e, dê û bavê wê baş in, hevalên wê Sêvê, Ahmo û Karê mirovên baş û



hevalên ji dil in, malbatên wan (ji bilî bavê Karê) baş in, di vê çîrokê de du kesên nebaş Qaçax û bavê Karê ne. Di çîrokê de tiştê ne-asayî naqewime. Heman xweşbînî ne bi qasî çîroka yekemîn be jî, di çîroka duyemîn de jî heye. Di gel ku ev çîrok bi awayî xwestir hatiye honandin û hin caran mirov dikeve nava endîşe û metirsiyê jî, di dawiyê de Mirad û Rihan digihîjin mirazê xwe. Di vê çîrokê de hinekî nakokiya di navbera axa û gundiyan de jî heye.

Di çîrokên Sîma Semend de kana hemû xerabiyê nezanî ye. Li aliyê din pesndayînen ji bo sîstema sosyalîst mirovan difikirîne, gelo nivîskar di vî warî de çi qas ji dil e? Li hin deran çîrok diçe ser dirûvê çîrokên nivîskarên tirk ên di destpêka serdema komara tirk de. Di warê zimanê nivîskar de jî min divê ez çend tiştan bibêjim, hin awayên gotinê û devok hatiye parastin, her wiha daçek wekî 'di... da', 'ji... ra', bi... va' hatine bikaranîn, lê xweziya hin xelatiyên rastnivîsî jî aliyê redaksiyonê ve bihatana rastkirin. Mînakên wekî: 'Ahmo rabû lembe-yê vexist...' gelek in.

SAMÎ BERBANG

## ŞENGUL û MENGUL



## Şengul û Mengulê

Şengul û Mengul, di nav weşanên Weşanxaneyê Sara de derketiye. Kurmanc Zengene hewl daye ku vê çîroka gelêrî wekî piyese pêşkêşî biçûkên kurdan bike. Pirtûk 57 rûpel e û xêzên wê jî ji aliyê Fernando Donaire ve hatine çêkirin.

Dema mirov çewtiyên ku hatine kirin li ber çavan digire, mirov tê digihîje ku nivîskar, bi xwerûtiya zimanê çîrokê ve jî girêdayî nemaye. Ez dixwazim li jêr çend mînakên di gel awayê wan î rast pêşkêş bikim:

"Hebe nebe dirinyek herdukan xwariye (dirindeyekî herduk xwarine), ez ji kî bipirsim (ez ji kê bipirsim), her car destên xwe dan hev, çar destên hev girtin (her çaran destê xwe dane hev, her çaran bi destê hev girtin), tu bijmêre ku Şengul û Mengul li cem te ne (tu wisa bizane ku Şengul û Mengul li cem te ne), berî çend rojekî (berî çend rojan)."

Her wekî din di gelek peyvên de standart nîn e, li derekê gûr, li dereke din gur, li cihekî dinan, li cihekî diran hatiye nivîsîn. Li aliyê din nivîskar bizin kiriye nêr, mînakên wekî "bizinê feqîr", "bizinî got" û hwd. pir in.

## Refah

### û sîstema derewan (2)

A. MELİK FIRAT



Dema ku girtî di rojiya mirinê de bûn û hê mirin çênebûbûn, hinekan ji min pirsî: "Wê Şevket Kazan bikaribe ve pirsgirêkê çareser bike?"

Min got, na: "Şevket Kazan nikare. Ew ji Mehmet Ağar bêhtir di bin tesîra wan quwetên ku Tirkiyeyê îdare dikin de ye; ji emrê wan dernakeve."

Pişt re mesele nîspeten çareser bû, lê ne bi biryara (qerar) Şevket Kazan, piştî ku mirinan dest pê kir, Erbakan kete dewreyê. Û dibe ew hêz û quwetên ku biryara mudaxelekirina hepsan standibûn, dema ku dîtin dinya li ser vê meseleyê disekine, gava xwe bi paş ve avêtibin û wan bi xwe ji bo çareserkirinê destûr dabine Erbakan.

Mirovên ku bibin ehlê zîndanê, hewce nake ku ji temamê însanîyê tecerût bikin û fikrên xwe ji binî ve terk bikin. Ew, tiştên ku sîstemê qedexe kirine dikin û sîstem jî wan dike zîndanê, lê ew bi fikr û baweriya xwe dijîn. Lê ev zalimên were ne ku dibêjin na: Divê em li mêjiyê we jî xwedî derkevin; hûn jî mîna me bifikirin...

Di bingeha vê dewletê de fikreke şaş heye: Miletê vî welatî mîna ehlê mûstemleke dibînin. Ne tenê kurdan, tirkan jî... Ev fikra wan di

wexta CHP'ê de bêhtir eşkere bû, dû re hêdî hêdî kêmkirî bûye. Leşker, polis û burokratan ji xwe re islahkirina vî mîletî kirine wezîfe. Yanê Rojhilat (Xerb) qamçiyê xwe daye destê van...

Ev fikir, ev nêrîn hîna jî di nav partiyan de nehatiye guherîn. Ev fikr û nêrîna şaş di mêjiyê gelekên de çî girtiye, naguhere.

Yekî mîna Şevket Kazan doza misilmantiyê dike, lê dibêje: "Ez çer bi wan re dan û standinê bikim!"

Baş e, ev kî ne? Tu çima bi "gawiran" re rûdinî, lê bi welatiyên xwe re rûnanî? Eger ku ev xelkê vî welatî bin, sûcekî wan hebe jî, dîsa welatî ne, ji welatiyê nakevin. Ji aliyekî ve wan welatî nabînin, lê ji aliyê din ve ji welatiyan zêdetir tişt ji wan dixwazin... Ku ne welatî bin, qanûnên din, qanûnên beynelminel hene, wan bi kar bînin. Ne ev, ne ew... Tiştêkî qebûl nakin. Bi wan re jîyan pir zor e.

Tebîetê van mîna tebiyetê guran e. Ji êrîşên hovane, ji parçekirin, xerakirin û jihevixistinê pê ve tu fikreke wan a baş tune ye. Ez di vî warî de dikarim gelek tiştan bibêjim, lê wekî ku tirk dibêjin; gelek tişt tene bîra min, lakîn kelîme di qirika min de li hev siwar dibin, dibîne girêk...

Me ji sîstema van gelek dîtîye, gelek kişandîye... Ez dixwazim dema ku hîsiyatên xwe îfade dikim, bila tê de tecawiz çênebin, di nuqteya rastiyê de bimîne.

Islaha guran ne mimkûn e, ev tebiyetgur in. Gurîti ji xwe re kirine hedef... Yanê aşî û biratî û asûdetî van bêhteng dike, aciz dike.

Ev çil sal e ku ez di meydana siyaseta vî welatî de me. Dema ku ez dibêjim bêhteng dibin, lê min di nav tirkên ku xwedîti li vî rejîmî dikin de, yên ku aşî û biratiyê bi rastî

bixwazin, kêmkirî dîtine. Belkî ji hezaran yek...

Xwe ji qewmên din cuda dibînin, xwe serdest dizanin. Ji xeynî xwe, her kesî kêmkirî û biçûk dibînin. Lê ji aliyê din ve jî xwe pir biçûk dibînin. Li benda yekî ne ku talimatê bide wan, yanê bi serê xwe hereket nakin. Ji aliyê sewkê tabîi ve pêşkêşî ne, lê ji aliyê aqilê beşerî ve negihîştine kemalê, vîrnî mane. Ji ber vê yekê jî, nêzîkahiya wan a însanî kêmkirî e. Dinya bi çî şeklî bi pêş ve çûye? Tevgera siyasî, îçtîmaî, tevgera îktisadî çawa ye; em jî bi wî şeklî hereket bikin... Ev fikra wan tune ye.

Her tiştî teqlîd dikin.

Bi serê xwe hereket nakin.

Tenê di sê nuqteyan de bi serê xwe hereket dikin û wan ji kesî re nahêlin: Kuştin, talan û derew... Ev elametê farîka wan e. Li însanan zilim dikin, dikujin, talan dikin, malê wan dixwin... Derewan pir bi rehetî dikin. Ku yekî bikujin "me jê re qencî kir" dibêjin. Talan bikin, malên xelkê bibin, dîsa "me jê re qencî kir" bibêjin!

Ji zilmê re dibêjin, demokrasi...

Ji diktatoriyê re dibêjin, cumhûriyet...

Ji qanûnên zilmê re dibêjin, edalet...

Li dinyayê dewletên ku bi diktatoriyê tene îdarekirin hene, lê di nav wan dewletan de yên başî û qenciyê dikin jî gelek in. Lê di nav van de kêmkirî in. Mirov mêze dike ku di nav wan de; ji çî fikrî dibe bila bibe (yên ku dibêjin em misilman in, şerîetê dixwazin û yên ku dibêjin em marksîst in, edaleta îçtîmaî dixwazin) gotinên wan derew in, lefzen dibêjin. Tu îdareyê bidî destê wî, wî zalimê tîran çer kiribe, ew jî wer dike... Yek qesab e, te bi satorê hûr dike, yê din te narkoz dike ku tu zû bi xwe nehese. Ferqa di navbera wan de ev e...




# Mele û spor

**R**ojekê, li gundekî Kurdistanê kar û barê hevalan pir xurt bûye. Ji ber vê yekê dijmin dixwaze kar û barên hevalan belav bike.

Wekî tê zanîn gelî kurd bi oîa xwe ve pir girêdayî ye. Wexta ku qala olê dibe, bi mal û canê xwe, xwe jê re amade dike. Ji sedema vê yekê meleyekî ji hêla dewletê ve wekî sîxur dihat xebitandin û dijmin ew şandibûn wî gundî. Lê belê mele aligirê taxima Fenerbaxçeyê bû û gelek ji sporê hez dikir.

Rojek ji rojan maça Fenerbaxçeyê û limêja esirê ketine eynî wextê, fcar mele nizane ka here mizgeftê an here li maçê guhdariyê bike. Mele mecbûr dimîne, dihere mizgeftê. Dema diçe mizgeftê, mele difikire gelo ez bi çi awayî guhdar bikim. Çareyê dibîne, radyoyê dixê bêrika xwe, berguhkê jî dixê guhên xwe. Maçê jî dest pê kiriye. Mele diçe mizgeftê, millet jî hemû ji bo limêjê amade ne. Mele diçe li pêşiya wan disekine. Radyoya wî jî di bêrika wî de ye û spîkerê sporê dibêje.

Hem her du guhên wî li ser hakem in,



hem jî li pêşiya gundiyan limêj dike. Wexta ku millet serê xwe datîne ser sedê Fenerbaxçe goleki diavêje û mele ji bêhemdê xwe dibêje: "goolll, gooooool."

Dema mele dibêje "gol" gundî tev di-sekinin, lê dinêrin û dibêjin weleh heya niha me pir limêj dît lê me pê re gol nedît.

Gundî lê dikevin şikê. Wî dibin dixin bin pirsê, dawiyê dinihêrin ku mele ne mele ye. Mele sîxurê dewletê ye; ew jî bo ku çalakiyên hevalan xera bike û we-

latparêzan bide girtin, şandine gund.

Bi rastî jî îro rewşa Partiya Refahê ji wekî ya wî meleyî ye. Hatina wî ya îktidarê di bin navê olê de ye. Lê belê mebesta wî ew e ku gel bêhtir bi kemalîzmê ve girê bide û gel bixapîne. Gel, îro rewşa wî baş derxistiye holê û baş dizane Refah kî ye, çi ye, ji bo çi xebatê dike, çi qas li ser navê olê xwe jiyân dike. Ji ber ku rewşa Refahê jî mîna wî meleyî ye.

RIYAT AHMET HESEN

# Ji roja reş re

**L**i Başûrê Biçûk, li bajarê Efrînê yekî bi navê Mîhemed ji gundekî tê bajêr, da ku lazimiyê xwe pêk bîne. Mihemed, xwe neyar e. Ji ber vê yekê demançeyê xwe jî hiltîne, dide ber xwe diçe bajêr.

Di sîka bajêr de neyarên wî wî digirin û lê dixin. Ew bi terzê ye, lê neyarên wî gelek in. Di gundê ku neyarên wî, pir lê dixin û wî hev dipelixinin, ew demançeyê dernaxe, li wan naxe.

Li ser serên wan gelek mirov civiyane. Yek ji nav wan mirovan dike gazî:

– Malxerab tu kuştin, çima demançeyê xwe dernaxî?

– Min demançeyê ji bo roja reş giran hildaye.

Zilamê biyan:

– Malxerab, qey ji îro reştir girantir roj hene? Wa te dikujin.

Piştî vê gotinê dîsa jî Mihemed demançeyê dernaxe.

XELİL MUSULI

## XELAT...

Ji ber ku heftiya borî bi xelatiyê di cihê bersiva xaçepirsa 27'an de ya 28'an hatiye weşandin, vê heftiyê jî em bersiva 27'an diweşînin.

1	2	3	4	5	6	7	8	9
K	E	V	N	E	P	E	R	E
R	A	B	Y	O	A	S	J	I
A	H	A	B	S	T	R	A	N
A	N	Z	A	K	A	D	E	
L	T	E	N	Ş	K	T	R	
T	D	S	T					
C	E	L	E	B	L	A		
P	A	L	A	M	A	R		
T	E	N	A	N				

PEYVA VEŞARÎ

### Bersiva Xaçepirsa 27'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binîrxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 30'an kasetê Dilovan "Şer Dikim" e.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qatîyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.




## XAÇEPIRSA BIXELAT (30)

## XAÇEPIRSA


Büyer Rewşen- birekl kurd (wêne)	Bajarekî italî Gundek li Cûlemêrgê	Xwişka Helepçe Mak	Sanahî, hêsan	Navek Parkitek	Kesê ji Italyayê
8				5	
Valahî, zirar ... Tahîrê Uryanî			Berevajiyê katot Miletêk		
	4	Diravê Japonan		Cinavkek	Beyreq
Ciwamêr Hidrojen			3	Pir Rojgar	
	Tav, roj Lasor	Jorî Qewmek			
Bane- şanek Nişandar	6	Beyanî Ramûsan	7		
1				Şuştin	
Masal	Sembola Amerîk- yûmê		Haceta por	2	



PEYVA VEŞARÎ







## Bîranîna Şêx Seîd

Şêx Seîdê kal di 29'ê Pûşpera sala 1925'an de li Amedê tevî 47 navdaran serhildanê daleqandin (xeniqandin) Şêx Seîd, ji sedan şêxek bû, ew jî mîna wan şêxan ji Tarîqata Neqşebendî bû. Lê nav, dilsoz û têkoşîna wî ew jî şêxên din vediqetand.

Jiyana wî tevî gel bû, şîretên wî jî bo baxiyê, dostaniyê û hevkarîya gel bû. Di nava gel de bûbû hêza çareserkerîna pîrsgirêkan, bi taybetî xudanê huner, pêşengiyê bû.

Mînak me got, jiyana Şêx Seîd, li medreseyan û di nava gel de derbas bûbû. Ew hem mamostê gel hem jî şagirtê gel bû. Ji gelê xwe gelek hez dikir, êşa gel, problemên gel, mîna yên xwe didîtin, rizgarî û serfiraziya gel armanca wî bû. Ji bo menfaetên xwe nedimeşî, nedixaft û têkilî çenedikir. Ji bo wî pêwîst jî nebû.

Ji bo wî jî pîrsgirêkên herêmi zêdetir pîrsgirêkên neteweyî girîng û balkêş bûn, ji nêzik ve temaşê û şîrove dikir.

Bûrayê wî Xalit Beg û Yûsif Ziya, tevî çend pêşhatiyên Komeleya (partî) Îstîklala Kurd li Xînuşê damezirandin. Mîralay Xa-

lit Beg û mebusê Bedlîsê Yûsif Ziya hatin girtin. Şêx Seîd serokatiya tevgerê girt û têkoşin berdewam kir, gund bi gund, navçe bi navçe digeriya. Weaz didan, gel ji bo serhildanê tevger dikir.

Roja serhildanê 21.3.1925'an hatibû diyarkirin, lê bi komployeke, bêdaxwaziya Şêx Seîd serhildan zû dest pê kir, di demeke kurt de li gelek bajar û navçeyan belav bû, ji ber gelek sedeman serhildan hat şikestin; bi deh hezaran kurd hatin kuştin, gund, navçe û bajar kambax kirin, xayinê mezin Qaso, Şêx Seîd da girtin.

Kedxwarên tirkan bi kêf û tinazan Şêx Seîd anîn Amedê; di dilê Kurdistanê de tevî 47 kesên xeniqandin. Qatilan ji bo ku tîrba wî nebe cihê serdana kurdan, veşartin.

Belê 71 sal bihurin, têkoşin berdewam e. Şêxê nemir tu êsanî razê, îro bi deh hezaran neviyên te, keç û xortên Kurdistanê li dijî neyarên te şer dikin, doza te û ya hemû şehîdan didomînin; tola we digirin, cihê te nûr be.

AHMET BARAÇKILIÇ

**Bûrayê wî Xalit Beg û Yûsif Ziya, tevî çend pêşhatiyên Komeleya Îstîklala Kurd li Xînuşê damezirandin. Mîralay Xalit Beg û mebusê Bedlîsê Yûsif Ziya hatin girtin. Şêx Seîd serokatiya tevgerê girt û têkoşin berdewam kir. Gund bi gund, navçe bi navçe digeriya. Weaz didan, gel ji bo serhildanê tevger dikir.**

## Cejna 15'ê Gelawêjê

Heyva Gelawêjê di dîroka gelê Kurdistanê de heyveke zehf girîng e. Ji ber ku serhildana pîroz, di vê heyvê de dest pê kiriye.

Li dijî zilm û zordariya romê di vê mêjûyê de gelê Kurdistanê dest bi têkoşîna çekdarî kiriye. Wekî tê zanîn, tu maf nayên dayîn, ancax tînan standin. Tu caran, tu maf bîxwîn, bêberdêl nehatine standin.

Di dîrokê de mînaka, mafê bêberdêl tune. Ji bo vê yekê têkoşîna çekdarî bûye ferz. Ji 15'ê Gelawêja 1984'an heta 15'ê Gelawêja 1996'an gelek tişt hatin safikirin, gelek qonax hatin borandin.

Ji van hinek mînakên ku, kor dibînin, ker

**Di sala 1984'an, di meha gelawêjê, di roja 15'an de kerameta (mûcîzeyay) mezin çêbû. Ew nexweşê xedar, rêwiyê mirinê yek car rabû ser xwe û got "ez namirim". Dijmin li ber vê rewşê şaş ma.**

dibihîsin a ewilî li hemû dinyayê qebulkirina hebûna kurdan, sazûna PKDW'ê, weşana TV-MED'ê, weşanên kovar û rojnameyên kurdî, lêkolînên li ser zimanê kurdî û dîroka Kurdistanê û hwd. Tu kes nikare bibêje ku ev maf ji bo çav û biriyê kurdan ên reş hatine dayîn. Mafê tu kesî tune ye ku bibêje ev maf nîmetên dijminê xwînxwar in. Ji bo ku ev maf werin standin, bi hezaran Egîtên me, Zozanên me, Mazlum û Bêrîvanên me canên xwe yên şîrî kirin berdêl.

Berî 15'ê Gelawêja 1984'an gelê kurd ketibû halekî zehf xedar, wekî nexweşê ber mirinê, qîrîna wî erd û ezman derbas dikir. Ji bo başbûna wî yek keramet (mûcîze) lazim bû. Lê dijmin bi vê yekê jî nedisekinî, dixwest ku di carekê de bikuje û ser go-

ra wî beton bike. Lê hesabê mal û sûkê hev negirtin.

Di sala 1984'an, di meha gelawêjê, di roja 15'an de kerameta (mûcîzeyay) mezin çêbû. Ew nexweşê xedar, rêwiyê mirinê yek car rabû ser xwe û got "ez namirim".

Dijmin li ber vê rewşê şaş ma, ji çav û guhên xwe bawer nikirin. Ji bo ku xwe û derdorên xwe bixapînin, leyistik neman gişt listin. Lê feyde nekir, îro hemû tişt li holê ye. Gelê kurd rabûye ser lingan. Ji dêla dengê nalenalê, dengê serkeftin û azadiyê erd û ezman dihejîne.

Emê bipirsîn ev kerameta mezin çi bû? Ew bijîşkê ku nexweşê ber mirinê rakir ser piyan kî bû? Yek bersiv tê dayîn; ew tevgera azadiyê bû.

MURADÊ SURUCÎ

## WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Gazete)

Li ser navê Zerya Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına Xwedî (Sahibi) CELALETTİN YÖYLER

Gerînendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni) MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê (Yayın Kurulu) AYNUR BOZKURT SAMİ TAN RAHMÎ BATUR

Berpîrsê Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê (Müessese Müdürü) TAHİR ELDEMİR

NAVNIŞAN Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu / İSTANBUL TEL-FAX (0 212) 251 90 13 ÇAPXANE Yeni Asya Matbaacılık A.Ş. BELAVKIRIN BIRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME (Temsilciliklerimiz) Nîmînenendeyê Giştî yê Ewropayê: Mazhar Günbat Suriye: Jan Dost Helim Yûsiv 963-21-960099

Berlin: Silêman Sîdo 49-30-69002695

Hannover: Selim Biçûk 49-5721-81360

Munchen: Mahmut Gergerli 49-871-670884

Bruksel: Medenî Ferho 32-02-466037

Stockholm: Robîn Rewşen 46-8-7510564

Bonn: Ahmet Baraçkılıç 49 228 66 62 49


Hollanda: Remzi İlhan 312 06 32 31 28

Celle: Wezir Saçık 49 50 52 87 36



# Yezdan Xweldî Kela Xoşavê diparêze

Axayekî kurd ku navê wî Silêmanê Zer bûye, kelê ji nû ve çêdike, bi eşîreta xwe ve dibe xwediyê wê. Di salên 1650'an de begên osmaniyan li Wanê 29 rojan kelê didine ber guleyên topan, lê nikarin ji destê Silêmanê Zer derxin. Hin dîrokzan didine zanîn ku di wê demê de jî, li çiya kurdên ku li hemberî artêşa osmaniyan şer dikirin hebûne û bi piranî, ji ber wan, osmaniyan nikaribûne vê kelê îşgal bikin.



Kela Xoşavê

**L**i bajarên Kurdistanê kel, qesr, pir, medrese û mizgeft bi sedan avahiyên dîrokî hene. Piraniya wan tirk, ereb, faris lê xwedî derketine, yê mayî jî, ji bo ku dîroka kurdan neyê zanîn di berhemên nivîskî de cih nedane wan.

Kela ku bi temamî ji aliyê kurdan ve hatiye çêkirin Kela Xoşavê, pêncî km'yî dûrî Wanê ye û li ser rîya Wan û Cûlemergê cih digire. Tê gotin ku navê kelê ji Çemê Xoşavê tê, lê hin dîrokzan jî dibêjin çem navê xwe ji kelê digire. Li gorî hin çavkaniyan Kela Xoşavê berî Îsa di 810-786'an de ku Medan dawî li serdestiya Urartuyan aniye, ji aliyê Medan ve li ser girekî bilind ku bi temamî kevir e, hatiye çêkirin.

Di pêşiya kelê re rîyeke ku bajarê Wanê û bajarên Kurdistanê bi hev ve girê dide, heye. Hin dîrokzan dibêjin ku ew rê ji aliyê Medan ve hatiye çêkirin û şervanên Medan di wê riyê re çûne hatine, heta li hin deveran meqere jî çêkirine û Kela Xoşavê jî, ji bo bêhnvedanê û ji bo ku bandora xwe li ser bajarên bidine qebûlkin, ava kirine.

Piştî ku tirk hatine Anadolê Kela Xoşavê jî, girîngiya wê ya berê nemaye, heta demekê ketiye destê iraniyan û farisan jî û gelek rolyefên li ser kelê jî hatine talankirin.

Kel heta salên 1600'î bêxwedî û bêkes dimîne. Pişt re axayekî kurd ku navê wî Silêmanê Zer bûye, wê ji nû ve çêdike, bi eşîreta xwe ve dibe xwediyê kelê. Di salên 1650'an de begên osmaniyan li Wanê 29 rojan kelê didine ber guleyên topan, lê



Li Mezopotamyayê yezdan niv heywan, niv mirov bûne. Li gorî mîtolojiyê heke yezdan bi jinekê re biketa têkiliyê, dibûn mirov. Xweldî jî mirov e, lê li ser piştê şer digere. Mirov dikare wî jî wekî mînaeke bi vî rengî şirove bike.

nikarin ji destê Silêmanê Zer derxin.

Hin dîrokzan didine zanîn ku di wê demê de jî li çiya kurdên ku li hemberî artêşa osmaniyan şer dikirin hebûne û piranî ji ber wan, osmaniyan nikaribûne vê kelê îşgal bikin.

Kel ji bircên girover pêk hatiye, piştî ku dike destê Silêmanê Zer, wî bircên ku hilşiyane (hilweşiyane) bi kelpçên ji axê çêkirine. Wekî her berhemên ku kurdan çêkirine, li ser derî û stûnan rolyefên şer û yezdanan cih girtine.

Li ser deriyê kelê rolyefeke ku du heb şêrên bi zincîran ve bi hev û din ve girêdayî ne, hene. Li gorî hin dîrokanan, ew her du şêr bindestiyê temsîl dikin, li gorî hinan jî, şêr ji ber ku heywanên hov (wehşî) in bi zincîran hatine girêdan.

Lê di mîtolojiya gelên Mezopotamyayî û kurdan de, di destpêka nêçîrvaniyê de tenê ji bo nêçîrê xêzên heywanan hatine çêkirin, pişt re ew heywanên hov bi zincîran hatine girêdan an jî bi tîran hatine birîndarkirin. Ev jî nîşan dide ku hovîti hatiye qedexekirin.

Li ser stûneke kelê jî rolyefeke Yezdan Xweldî cih digire, orjînalê wê rolyefê hatiye dizîn. Yezdan Xweldî piştî ku Med li Anadolîyê bi cih dibin, ew Xweldî bi gelê heremê didine nasîn û bawerîya wan bi Yezdan Xweldî tînin. Li gorî mîtolojiyê jî Yezdan Xweldî tiştan ji talûkeyan diparêze. Ev jî bûye sedema çêkirina rolyefê Xweldî.

Di hundirê kelê de zîndan, hemam, odayên ji bo perwerdehiyê, mizgeft û cihê razanê hene. Kel ji 360 odayî pêk tê.